

Welatê Me


SALA WE YA NÛ
PÎROZ BE

ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL:1 HEJMAR:7

1 RÊBENDAN 1994

BUHA:25.000 TL(KDVD)



95: SALA EHMEDE XANÎ
pîroz be

JI ROJEVE

Sêsed saliya Mem û Zînê

Sala 1995, ji aliyê kurdan ve wek sala Ehmedê Xanî hate îlankirin. M. Emin Bozarslan, ji bo 300 saliya nivîsandina Mem û Zînê, pêşniyarek bir UNESCO û daxwaz kir ku 95, wek sala Ehmedê Xanî bê îlankirin. Lê ev pêşniyar nehate qebûl kirin.

Bozarslan jî jixwe êdî pey vê pêşniyara xwe neket û xwe zêde pê re neêşand. Bes shesedsaliya Mem û Zînê û bi vê mebestê wek sala Ehmedê Xanî îlankirina sala 95'an ji bo gelê kurd firseteke dîrokî bû. UNESCO qebûl nekir ji kurda di nav xwe û derdora xwe de dikaribû jê vê firsetê îstîfade bikra. Ji ber vê yekê YRWJK'ê û Enstîtuya kurdî ya Berlînê li vê firsetê, li Ehmedê Xanî xwedî derketin. Wan bi biryardarî ji bo ku sala 95'an bibe sala Ehmedê Xanî xebatên girîng pêk anîn. Di konferansa Mastrichtê de jî ev mijar xistin rojeva xwe ya sereke.

Konferansa Maastrichtê di 13'yê Tirmeha 1994'an de hate li darxistin, biryarek stand û sala 95'an wek sala Ehmedê Xanî îlan kir. Li gorî biryara Konferansê wê di nav sala 95'an de li gelek welatên Ewropayê civîn, konferans, mihîrcan û seminer li ser wateya vê salê bêne li darxistin.

RÊXISTIN Û REWŞENBÎRÊN KURD HÊVÎ DIKIN KU SALA 95'AN BIBE SALEKE XWERÛ BI KURDÎ Û SALA YEKÎTIYÊ JI BO KURDAN

SALA EHMEDÊ XANÎ PÎROZ BE

Ji bo sala 95'an ya ku di konferansa Mastrichtê de wek sala Ehmedê Xanî hate îlankirin, kî çi difikire û dibêje. Me jî xwest ku em li ser sala Ehmedê Xanî, li nebza raya giştî ya kurdan binêrin. Me xwest em bêferqûmêhlî fikra gelek, rêxistin derdor û rewşenbîrên kurd bistînin. Ew kes û derdorên me navên wan tesbît kiribûn, em gihiştin zehfê wan, lê ji van M. Emin Bozarslan, li gorî prensîbên xwe, nexwest dîtînen xwe bibêje. Kemal Burkay, Kendal Nezan û Wildan Tanrikulu jî, ji ber Cejna Noelêne li cihê xwe bûn. Ji ber wê yekê ne di nav îmkanan de bû ku me xwe bigihanda wan. Em li Enqere, Stenbol û Ewropayê li nûnerên YNK û PDK'ê bi telefon û faksan geriyar, lê mixabin me kesekî wan peyde nekirin. Bi rastî jî di mijareke welê girîng de me pir dixwest ku em dîtînen hemû eleqedarên doza kurd û Kurdistanê bistînin.

Li ser îlankirina sala 95'an, wek sala Ehmedê Xanî û ji bo kurdan 95 lazim bû çawa, an wê çawa derbas biba, fikrên ku me standin ev in:

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê û YRWK

Sala 95'an, em li Parisê weke sala Ehmedê Xanî îlan dikin. Ev barê giran me daye ser milên xwe. Bila gelê me di wê baweriyê de be, emê layiqî Xanî wê ev sal heya dawiya saleke serkevtî be. Hem

Konferansa Xanî, hem jî Xelata Xanî, wê salê mezin bikin.

Murat Bozrak (Serokê Partiya Demokrasi ya Gel, HADEP)

Kultura kurdan, pir mezin û fireh e û heta îro dewam kiriye, lê çi heyf e ku ji aliyê dewletê ve hatiye qedexekirin. Mirovekî wek Ehmedê Xanî jî ji vê kulturê tê. Sala 94'an pir baş derbas bû, wê 95 jî pir baş be û li pêş kurdan gelek îmkana nê û veki.

Îsmet Şerîf Wanlî (Serokê hiqûqvanê kurd ên Ewropa)

Berî 300 salî Mem û Zîn hate nivîsandin. Gereke Kurd li Ehmedê Xanî xwedî derkevin. Di 1995'an de bi vê munasebetê gelek çalakî (konferans, şano, û hwd.) bûn li dar xistin.

ERNK (Berpîrsiya-riya Ewropa)

Mem û Zîn, hezkirina di navbera kurd û Kurdistanê de ye. Xanî wekî filozof û welatparêzekî mezin,

rewşa gelê kurd, kurdistanê û dagirkiran bi şeweyekî eşkere şirove kiriye. Hêviyên Xanî yên ji bo serxwebûnê, îro PKK, Serok Apo pêk tîne. Xanî azadî dixwest, di azadiyê de jiyan didît. Nihayî hûn dibînin, li Kurdistanê roj bi roj jiyan diafire.

M. Emin Pîncewî-nî (Şair)



Hêviya min di vê salê de xurtbûna tevgera rizgariya neteweya Kurdistanê ye. Di vê salê de ez hêvî dikim ku çand, rojnamegerî, huner, dîplomasi û hwd. bi pêş kevin. Ji bo ku ev war bi pêş ve herin navê Ehmedê Xanî li sala 95'an hatidî danîn.

Remzi Kartal (Membûsê DEP'ê)

Dinya tev êdî dizane ku gelê kurd têkoşîneke neteweyî dimeşîne û ketiye ser riya azadiyê. Ev sal, ji bo me saleke pir bihêviye. Gerek e ev sal li gorî dil û hêviya Ehmedê Xanî bibe sala pêşveçûn û mafstandinê. Em bawer in sala 95'an wê xweş û ronahî derbas bibe. Gerek e kurd vê rastiyê bibînin û bi wê şekî, xwe amade bikin. Gerek e ev sal di her warî de bibe sala serhil-

DEP'ê û nivîskar)

Wî berî sê sed salan li ser dewlet, hikûmet û neteweyê nivîsandiyê û ev tiştêkî pir girîng e. Divê ji her aliyê ve kurd wî rind fêhm bikin. Ne tenê ji bo me, ji bo hemû dinyayê netîceyên baş dikarin ji vê salê bîstandin. Wê çaxê emê bibêjin ku sala 95'an layiqî Ehmedê Xanî çêbû. Gerek e em vê salê li gorî mezinahiya navê Ehmedê Xanî bigihînin.

İbrahim Genç (Navenda Çanda Mezopotamya)

Sala nû jî em bawer dikin sala nû ku navê Ehmedê Xanî lê hatiye kirin jî, dê bi xwe re, ji bo gelê kurd, di her warî de gavên pêşve-tir bîne. Di vê salê de, kurd hîn bêtir wê li kurdîtiya xwe xwedî derkevin, ji ber vê jî, şerê ku li welêt heye, dixuye ku dê germtir bibe, ji ber ku birêvebirên tirkên kor in û pêşiya xwe nabînin.

Firat Cewerî (Xwedîyê kovara Nûdemê)

Li Ehmedê Xanî û fikrên wî xwedîderketin nîşana peydabûna hîsên neteweyî ye. Divê di sala 95'an de nivîskar, siyasetvan, dewlemend û çapemeniya kurdan bi giştî meyla xwe berdin ser zimanê kurdî û bi vî awayî wasiyetnameya Ehmedê Xanî bi cih bînin. Bi tirkî li Ehmedê Xanî xwedîderketin teneqîştina wî ye.

A. Bakir Karadeniz (Gerîndeyê Weşana Rojnameya Özgür Ülkeyê)

Yaşar Kaya (Serokê rûmetî yê

JUTİ

Doğan Güzel



Gava ku li sewiyeya têkoşîna azadî ya îro ya gelê me bête nihêrtin, ev tişt tê dîtin: vîna ku dixwaze sala 95'an bike sala serfiraziyê, serdest bûye. Eşkere ye ji bo ku hevî bibê rastiyekê divê em bêtir bixebitin.

Berpirsiyariya ERNK'ê ya Balkanan

Di vê salê de lazim e derxistina hejmareke taybet ku Ehmedê Xanî û felsefe, helbestvanî û hunermendiya wî ya mezin, bi dorfirehî bide naskirin.

Orhan Kotan (Xwediyê rojnameya Realite Press)

Pêşxebatên bi mebesta pîrozkirina sala 95'an wek sala Ehmedê Xanî ne kafi bûn. Eger bi însiyatîfa hemû grub û rewşenbîrên kurd ev sal bihata pîrozkirin wê zehf çêtir bûya. Îro kurd ji hev hatine belavkirin. Ew kesên îdiayên mezin dikin gerek e siyasatên nû biafirînin. Ez zêde nebêhevî me, lê bi rastî pir biendîşe me.

Feqê Hüseyin Sağnıç (Enstîtuya kurdî ya Stenbolê)

Kurdan heta 1980'yan xweyîti li hêjehiyên xwe nedikir, li yên xelkê dikirin. Îro li hêjahî û qehremanên xwe xwedî dertên. Ez hevî dikim ku ji bo hêjahiyên me yên din ji xebat bîn kirin. Ez bawer im wê sala 95'an wê ji ya 94'an çêtir be. Lewra sama 94'an jî ji sala 93'yan çêtir bû.

Sabah Kara (Xwediyê kovara Nûbiharê)

Ehmedê Xanî, ji bona me kurdan ji sê aliyên ve pir girîng e: ji aliyê pedagogiyê ve bi "Nûbihara" xwe; ji aliyê Îslamê ve, bi "Aqida Îmanê"; ji aliyê milliyet û kurdûnê ve bi Mem û Zîna xwe pêşiya kurdan ronî kiriye û îro şîrove kiriye, ev pir calib e. Em Ehmedê Xanî, di vê salhaê de bi civîn û bernamêyên mezin bi her kesî bidin nasîn.

Heyva Sor a Kurdistan (Atîna)

Destpêkirina xebat ji bo çekirina filmek li ser jiyana Ehmedê Xanî. Em bawer in ku bi vî awahî helbestvan baştir ji hêla kurd û cihanê ve wê bête naskirin.

Şerafettin Elçi (Wezîrê berê)

Lazim e kurd dijminatîya hev nekin û êrîşê nebin ser hev. Ferqiyên biçûk, divêt nebe sebebê bêtifaqiya wan. Bi vî rîyê armancên wan yên mezin û yên muşterek wê wan bigihîne hevdu. Kurdên bi her awayî dixebitin, terz û rîyên wan ne wek hev bin jî dema lazim be, destê hev bigirin û alîkariya hev bikin. Ez hêvîdar im ev rojên tî, wê jî rojên borî xwestir bin.

Ahmet Ünal (Rojnameya Jiyana Nû)

Sala 94'an, di nav xebata dîplomatîk de derbas bû. Wê kurd mahsûla vî dîplomasiyê di sala 95'an de bistînin. 95, wê bibê sala Yekîtiya Neteweyî ya Bakur. 95, wê bibê sala Kongreya Neteweyên

Kurdistan. Sala 95'an, ji bo kurdan hem li bajarên Kurdistanê û hem metropolên Tirkiyeyê, wê bibê sala serhildanan.

Ümit Fırat (Avakerê Partiya Yeni Demokrasi Hereketi)

Ez di 95'an de dildikim ku kurdan, di her warî de biserkeftina damezrandina saziyên şûngirtî kiribin. Saleke ku kesên cihê difikirin, bikaribin di jiyana de bi hev re bijiyin. Yanî kesên ku bi hev re dijîn, karibin bi tolerans, hurmetê ji fikr û cihêdîtinên hev re bigirin. Ez saleke wiha dildikim.

Mustafa Reşid (Nivîskar)

Sala 1995'an, ku bûye sala Ehmedê Xanî heyameke gelek girîng e. Hêviya me ew e ku di vî salê de û di bin navê Ehmedê Xanî de hemû rewşenbîrên Kurd, yê hêja bigihên hev û hêza xameyê xwe tîxin xizmeta rizgariya gelê kurd û avakirina welatekî serbixwe.

Zeynelabidin

Kızılyaprak (Rojnameya Newrozê)

Li gorî min her salek, ji bo gelê kurd gavavêtinên pêşde anîne û ji bo pêvajoyên nû, rê vekirîye. Sala 95'an ji gelek aliyî ve bi tiştên nû dagirtiye. Wer tê xuyakirin ku hem gelê kurd û hem jî kadroyên wê, ji bo ev sal bi gavavêtinên nû dagirtî bin, di nav hewldaneke mezin de ne. Em bi hevî li vî salê dinê, ji ber ku sebêbên me hene.

A. Yezdan (Nivîskar)

Di 300 salvegera nivîsina Mem û Zînê de, pêwistî bi Ehmedê Xaneyên nû heye. Em Ehmedê Xanî bi bîr bînin û Ehmedê Xaneyan zêde bikin!

Helbestvan Gundî (Nivîskar)

Zaneyê Kurd yê mezin berî 300 sal rewşa neteweyî ya kurd gelek zelal dîtiye û pêşniyarên dîrokî jî pêşkêşî gelê xwe kirine. Ji ber giranbîhabûna Ehmedê Xanî di dîroka me de ez sala Ehmedê Xanî pîroz dikim û pir hêvî dikim ku ew ji hemû rewşenbîrên me re bibê nimûneya kar û xebat.

Ali Beyköylü (Stêrka Rizgarî)

Ev, ji bo me kurdan bextiyariyeke pir mezin e. Bi bawerîya min wê di vî salê de, di nav sazî û rêxistinên kurdan de zelaliyek çêbibe û cihêbûnê ra bin. Di warê dîplomasiyê de wê kurd xwe bêtir bidin nasîn û bi devekî bi axifin. 95, wê ji aliyê hêzên dewletê ve li hemberî saziyên kurdan bibê sala êrîşan. Daxwaza min hemû kurd beşdarî vî salê bibin.

İ. Nasso (Nivîskar)

Bi bîranîna Ehmedê Xanî di sala 1995'an de serfiraziyêke rewşenbîrî ye. Wêjeyan û helbestan Ehmedê Xanî, rîyeke zelal danî, divêt rewşenbîr wê rîyê berdewam bikin.

WELATÊ ME

...KURTENÛÇE...

Mala Kurdan cih guhert

Mala Kurdan ya Moskovê, cihê xwe, ji ber biçûkbûnê guhert. Di 25'ê berfanbarê de, bi beşdariya 150 kurd û mêvanên wan ên rûs, ermen û azêrî ve Mala Kurdan cihê xwe yê nû vekir. Di cihê nû de Kurdistan Komîte, Komele, Navenda Çandê, Navenda Çapemeniya Kurdan û Konfederasyona Kurdên Civata Dewletên Serbixwe hene. Di vekirîna de Berpirsiyarê ERNK'ê Mahir Welat, li ser tîkiliya kurd û rûsan axaftinek û bal kişand ser cihgirtina kurdan a di nav tekoşîna rizgariya Kurdistanê.

Leşkerî Dirêj Bû

Li Tirkiyayê mudeta leşkeriyê dîsa hate dirêjkirin. Wezîrê Parêziyê Mehmet Gölhan, daxuyand ku leşkerî ji bo segman (leşkerê bêrutbe) ji 15 mehan derdikeve 18 mehan û ji bo leşkeriya kurt jî, ji 6 mehan derdikeve 8 mehan. Ev yek ji bo serbazên unîversîte xwendî jî ji 12 mehan derdikeve 16 mehan. Her wiha Wezîrê Parêziyê derbir ku mudeta leşkeriyê nehata dirêjkirin wê seferberî bihata îlankirin. Leşkerî, du sal berê, hatibû kurtkirin.

Doza Qetlîama Sêwazê Qediya

Doza qetlîama Sêwazê ya li ser şewitandina Otela Madimakê ku 37 mirov tê de şewitîbûn, li DGM'ya Enqerê kuta bû.

Mehkemeyê li 22 kesên 15 sal, li 3 kesên 10 sal, li yekî 5 sal, li 54 kesên 3 sal, li 6 kesên 2 sal cezayê hepsê birî û 37 kesên jî, ji ber nebûna delîlan bereat kir. Di heqê NivîskarAziz Nesîn de jî, îlanata sucê (ji ber sedemê tehrîkkirinê) kir.

Temenê Hêza Çakûç Dirêj bû

Mudeta Hêza Çakûç ji aliyê Meclîsa Tirkiyeyê ve di 28'ê berfanbarê de hate dirêjkirin. Di dengdanê de li hemberî 116 dengên neyînî, 202 dengên erênî derketin. Hêza Çakûç, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî di nav de ji aliyê İngiltere, Fransa û Tirkiyeyê ve phek tê. Hêz piştî Şerê Kendavê bi hinceta ku kurdên başûr ji êrîşên Sedam biparêze ava bû.

**Navên
10 kesên
xelatgirtî**

**Coşkun Selçuk
İskenderun**

**Ahmet Özdemir
İzmir**

**Sedat Öncü
Mardin**

**Murat Aslan
Urfa**

**Hikmet Tekin
Urfa**

**Münever Karadeniz
İstanbul**

**Eyyup Demir
Kızılay/Ankara**

**Ender Barış
Şırnak**

**Necati Kartal
Malazgirt**

**Yılmaz Atlığ
Bartın**

Ji rojnameya turkish daily news'ê

Kesên ji xwezaya xwe derewkar hatine dinyayê

**Rojnamevanê
turkish daily
news'ê Burat
Bekdil li ser
siyasetvanên tirk
nivîseke balkêş
nivîsandibû. Em
wê nivîsê qismen
werdigerînin û
pêşkêşî xwende-
vanên xwe dikin.**

Tu pîvan di destê me de tunene ku em bizanibin ka ew mirov ji dayika xwe derewkar bûne an na.... Tenê rastiyeke ampîrîk heye: Ew mirov ne tenê lê xebitîne ku bibin derewkarên profesyonel, lê ew bûne koleyên azweriya (hîrsa) xwe ya politîk.

Aliyekî qerfok(komîk) yê enflasyona Tirkiyeyê ku ji kontrolê der e daxuyaniyên politîkavanan ên li ser vî bêtîkrariya makroekonomîk e...

Destpêka van daxuyaniyên qerfok diçe heta

Enflasyon



kontrolê

dikeve



hema

binê



niha...



6 derewkarên xwezayî...

destpêka salên 1980'yî. Vê demê Turgut Özal hejmareke mezin rey standin û piştî sê salên rêveberiya leşkerî bû serokwezîrê yekemîn.

Wî israr kir ku ewê enflasyonê bixe bin kontrolê û enflasyona ku ji sedî 50-60 bû, daxîne

dora ji sedî 20'an. Lê piştî rêveberiya wî enflasyon gihîşt derdora ji sedî 70-80'yan...

Ev menzere piştî Özal ji neguherî. Özal bû serokkomar, Mesut Yılmaz hat, tinazan dom kir...Di sermaweza (meha 11) 1991'an de Demi-

rel bû yê ku xwe da ber barê daxistina enflasyonê, nîsbeta enflasyonê di hilberiyên berxweriyê de ji sedî 68.2 bû, dema di 1993'yan de ew bû serokkomar ev rêje (nîsbet) daketibû ji sedî 65'an. Serokwezîr Tansu Çiller û cîgirê wê Murat Karayalçın di nava rûpelên "Pirtûka Derewên Politik de" ji xwe re payekî bilind standin.

Enflasyona ku ji sedî 73.1 bû di sal û nîvê de duqat zêde kirin. Çiraka serkeftina wan bi evqasî neqediya. Di nava 9 mehê vî salê de çalakîyên aborî bi 6.1 derceyan daket binê sifirê.

Taybetiyeke wan her du canikan jî ev e: Di gel ku wan ekonomî noqî binî avê kir, dîsa jî ew hîn israr dikin ku li ser kar bîmînin... Divê yek bi serokwezîr û cîgirê wê bide zanîn ku mafê wanî istifakirîne heye.

Di dema guftûgoyên

buçeya 1995'an de Karayalçın (tê gotin ku ew jî ekononmîst e) li meclîsê daxuyand ku wê hikûmet bigihîje hemû armancên xwe yê 1995'an.

Armancaên hikûmetê ev in: 198 milyar qelîşteka buçeyê, ji sedî 22.5 enflasyon û ji sedî 4.4 reje ya mezinbûna aborî.

Heta niha gelek tiştên nebaş li ser van her du kesan li vî quncikî hatin nivîsandin, êdî wext hat ku ez sozê bidim, sozeke ku ji sedî sed bê girtin. Heke hikûmet bigihîje hedefên ku daxuyandine,

1 Lêborîneke vekirî ku ji Çiller û Karayalçın tê xwestin, wê li vir bê weşandin.

2-Jîrî û jihatîbûna siyasî û aborî ya wan her du dewletmendan wê hew li wî quncikî bê pirsîyarkirin.

Wergêr:

SAMÎ BERBANG

Xaçepirs bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tî belavkirin. Xelata vî heftiyê pirtûka **Jan Dost** "Kela Dimdimê" ye. Peyva veşarî ya xaçepirsa hejmara 5'an: **Mehabad**

Jêrenot:
Me bersivên peyvên veşarî yê hejmara sêyemîn û çaremîn tevlihev kiribûn. Rastiya wan wiha ye: Peyva veşarî ya 3'an **'Berxwedan'**, ya 4'an jî **'Serhildan'** bû.

Xelata Xaçepirsê



**"Kela Dimdimê"
Jan Dost**

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

- | | | |
|---------------------------------|---|---|
| <input type="checkbox"/> 3 Meh | <input type="checkbox"/> Li Hundir 400.000 TL | <input type="checkbox"/> Li Derve 30 DM |
| <input type="checkbox"/> 6 Meh | <input type="checkbox"/> 800.000 TL | <input type="checkbox"/> 60 DM |
| <input type="checkbox"/> 12 Meh | <input type="checkbox"/> 1.600.000 TL | <input type="checkbox"/> 120 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264-1

Li Derve - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV û PAŞNAV :
NAVNIŞAN :

Navnişana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 - 245 29 91

X A Ç E P I R S A B I X E L A T

İman	Strî	Sembola Hidrojenê	Nivîskarê di wêneyê de tî dîtin	Rojek	Roj
Wêran	Zindîkirin	Sembola Lityûmê	Tofan	Keştî	
8			Diristkirin avakirin		9
Kindirê risîn	3		Qomutanê qada bakur		
Erdê bêav			Notayek		
1		Şaristaniyek kevin Biavkirina baxçe	5		Eşîr
Rih		Neteweyek			Ji nexweşîne diparêze
Zamîr			Tipek	Beyreq	
				Şerm	
		Senceq	2	4	Bazar (Çarşı)
		Qels			
			Giravek li Yewnanîstanê		
		Irq			Gihanekek
		Rengek			
			6		
			Lîstik		

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9

WELATÊ ME

DIK

Destên Berlusconi!

Ew ji du salan zêdetir e ku li Îtalyayê dizî, bertilxwarin, karên nejirê, têtikiliyên bi mafya re serê hinek karsaz û polîtîkavanan dixwê. Dadgerên Milanê, Romayê û Napoliyê ji ber sûcên bi vî rengî ji 3 hezarî zêdetir doz vekirin. Serokwezîrê berê Giulio Andreotti û Bettino Craxi bi ber vê pêlê ketin. Navê fir-mayên wek Fiat û Olivettiyê ji ketin nav îdianameyên dozgeran. Partiyên mezin top avêtin. Li Sicilya û navarasta Îtalyayê êrîşên mafya yê li hemberî dozger û dadgeran zêdetir bûn. Navê "destên paqij" li vê kampanyaya li dijî karên xirab hate kirin. Li Îtalyayê piştî ku sosyalîst û muhafazakar, bi ber vê lehiyê ketin, komunistên berê "Partiya Çepgir a Demokratîk" û partiya faşîst "Hevkariya Neteweyî" wekî du hêzên xurt derketin pêş.

Di hîlbijartina herêmî de çepgirên zora faşîstan bir, lê burjuwayên Îtalyanî di nava sê mehan de bi patronê mediyayê Silvio Berlusconi partiya "Forza Italia" yê dan avakirin. Di hîlbijartina giştî ya 27-28'ê adarê de vê partiye bi Liga Bakur û Hevkariya Neteweyî re îtîqekek çêkir û bi ser ket. Hêzên kapitalîst ji bo ku hikûmet nekeve destê çepgirên her çiqas wan dev ji sosyalîzmê berdabe jî-bi lez tevgereke wisa ava kirin û ew bi ser ji ket, lê mixabin destên serokwezîrê nû nepaqij bûn. Hîn şeş meh derbas nebûbûn Silvio Berlusconi derket ber dozger û pişt re jî îstîfa kir. Wisa dixuye heta ew sistema hebe desthilatî (îxtîdar) nakeve destê paqij.

SAMÎ BERBANG

Li cîhanê dîsa şer û pevçûn hebû



FÎLÎSTÎN

Herêma Xweser (otonom) a Filistînê ava bû, Lê şer her berdewam e. Ji bilî şerê berê, şerê hundirîn yê filistîniyan jî dest pê kir. Êdî ji Serokê RRF'ê (Rêxistina Rizgariya Filistînê) Yaser Arafat re "Waliyê Gazayê" tê gotin.



MEKSÎKA

Salê, bi serhildana xwecihên Meksîkayê dest pê kir. Xwecihên vî welatî di 1'ê rêbendanê de li eyaleta Chiapasê, bi daxwaza wekheviyê û jiyanekê baş, serî hildan. Di şerê serhildêrên EZLN'ê (Eniya Rizgariya Neteweyî ya Zapatistan) û artêşa Meksîkayê de 145 kes mirin, pişt re şer hate rawestandî, lê gavên ji bo aştiyê bi ser neketin. Dewlet naxwaze daxwazên serhildêran bîne cih. Di dawiya salê de şer ji nû ve dest pê kir.



Ji rojnameya Al-Arab

Di sala 1994'an de jî di gel hinek gavên aştiyê û lihevkerînan, dîsa şer û pevçûn hebûn.

Bi sed hezaran mirov hatin kuştin, xizani, bindestî û dubendî li nav mirovan kêm nebûn, lê heviya mirovahiyê ya ji bo azadî û aştiyêke birûmet jî gurtir bû.



ÎRLANDA

Pêvajoya aştiyê ya ku di dawiya sala 1993'yan dest pê kiribû, bi şerrawestandîna IRA'yê ya meha gelawêjê gihîşt qonaxê nû. Piştî şerrawestandîna IRA û Lo-yalîstan di navbera Îngilîz û Sinn Fein de de li hevrûniştinê aştiyê dest pê kirin.

HAÎTÎ

Di meha rezberê de, Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê bi serokê cuntaya Haiti re peymanek îmze kir û li ser navê demokrasiyê kete Haitiyê. Li dû leşkerên Amerîkayê sazkarên cuntayê çûn derve, serokkomarê berê Jean Bertrand Aristide hat ser kar. Her çiqas ew wek serokkomar tê rêdan jî, êdî tu hûkmê wî nîn e.



AFRÎKAYA BAŞÛR

Di 17'ê avrêlê de li Afrîkaya Başûr Serokê ANC'ê (Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê) Nelson Mandela bû serokkomar û dawî li rejîma nijadperest hat. Niha derdikeve holê ku rayedariya siyasî tîrî jîholêrakirina nexweşiyên rejîma nijadperest nake. ÇermSPIYÊN ku kontrola aborî û hêzên ewlekariyê di dest de ne, nahêlin ku birînên xizanên reşik bîr dermankirin.

FAL

**BERAN** (21 Adar - 20 Avrêl)

Di kîtaba we de teslîmîyet tune. Di ruhê we de mace-raperestî heye, lê carinan hûn guhê xwe didin peyvên xelkê. Dev ji bêqerariyê berdîn û guhê xwe bidin wijdana xwe. Heyecan, we ciwan dike.

**GA** (21 Avrêl - 21 Gulan)

Baş e ku hûn insanên helîmselîm in û bêhnfireh in. Hin kes, wek mîşên ku li mirina xwe digerin, li ser serê we dikin vîngîn. Hûn zanin çima ew kes we aciz dikin? Ji ber ku hûn li hemberî her tiştî bédeng in.

**CÊWÎ** (22 Gulan - 21 Pûşper)

Hûn henekê xwe bi kesên ku serê wan pir naşixulin, dikin. Ji van tiştan jî hûn zewqekê distînin. Lê ji bîr nekin, herkes ne bêhiş e, dibe ku hûn bibin qurbana zewqên xwe.

**KEVJAL** (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Hûn çiqas mirovên hesas in, dilê we çiqas tenik e. Ji bo peyveke nexweş, hûn dikarin bi rojan xemgîniyê bixşînin û hûn hêsrên xwe wek baranê dibarînin. Van rojan herin nav sinemavanan, belkî hûn bibin artist.

**ŞÊR** (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Paye û xwemezindîtin, wek nexweşiyekê ji we re bûye komplekseke nebaş. Hurmeta mirovên modern li hemberî hev heye. Ger hûn jî xwe modern dihesibînin, bi çavên normal li insanan binêrin.

**SIMBIL** (24 Gelawêj - 23 Reşber)

Pir kêma kes dikarin bi qasî we tiştan înkâr bikin. Ev ji we re bûye tebiîtekê. Hûn gava xetayekê dikin, wek ku we tiştêkî wiha nekiribe, hûn hereket dikin. Hinekî li hemberî xwe durust bin.

**MÊZÎN** (24 Reşber - 23 Kewçêr)

Di jiyana we ya hîsî de hûn van hefteyên dawî neheqîyan li xwe dikin. Hûn dixwazin hevdu baş nas bikin, li qûsûran digerin, yanî pir hesabên biçûk dikin. Lê ew kesên li hemberî we li benda we nasekinin. Derbasbûyî be!

**DÛPIŞK** (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Ji hezkirinê netirsîn. Hûnê bibînin ku çawa moralê we tê cih. Bila fikreke nebaş di serê we de peyda nebe, lê xwe wek mirovên saf jî bi carekêve bernedin. Ma hîç we bihistiye ku lingên kesên dûrûst şemit îne?

**KEVAN** (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Wê gelek tişt ji bo we di van demên nêzîk de bê guherandin. Belkî hûn dest bi jiyaneke nû bikin. Elamatê vê guherandinê, di hundurê we de ye, guh bidin dilê xwe. Ecele nekin, baweriyê bi şensê xwe binin.

**KARİK** (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Hergav ji bo mirovan fîrset dernakeve. Destpêka vê sala nû baş fam bikin û xwe li gorî wê eyar bikin. Li ber tiştên çûyî pir nekevin, lê ji bîr jî nekin. Di vê sala nû de heke heta ku hûn karibin dev ji xuyê xwe yê înadê berdîn, wê baş bibe.

**DEWLİK** (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Jiyana we her tim bi 'bendewariyê' derbas bûye. Helbet mirov hêviyan bike baş e, lê hergav jî li benda tiştêkî mayîn, rûhiyeta insan xera dike. Di vê sala nû de hinekî bala xwe bidin pratîkê, yanî bi her awayî têkevin nava jiyânê.

**MASÎ** (20 Reşemî - 20 Adar)

Giraniyeke van rojên dawî ketiye ser we. Ne hewceye hûn jî bi tiştêkî wiha herin ber doxtoran. Belkî hûn ne di ferqa sala nû de bin. Hûn hîç fikirîne ku diyariyekê (hediya) bidin hevalekî/e xwe. An jî SERSALA WAN A NÛ PÎROZ bikin.


Ne sîr e û ne pîvaz e...

Beriyar mehekê, şîrîka koalîsyonê û serokwezîr Çillerê, di axaftineke xwe ya meclîsa tirk de digot: "Min, kela sosyalîzmê ya dawî xera kir." Baş xuya bû ku di mejiyê Çiller de sosyalîzm partiyên tirk ên sosyal demokrat bûn û kela wan a dawî ji nûnerê wan ê profesor Mumtaz Soysal bû. Dema Çillerê yeka xwe bi ser duyên Wezîrê "Karûbarê Derve Mumtaz Soysal xist, qanûna arizandinê bi parlamentoyê da qebûlkirin û Soysal jî îstîfa kir hingê Çiller bawer kir ku kela dawî ya sosyalîzmê berteref kiriye. Feqet li aliye din yekî din jî li wan deran hebû ku bi rastî ji di çavê xwe de xwe mîna keleya sosyalîzmê didît, ji ber wê yekê digot: "Di meclîsa me de ji min pêştir sosyalîst nîn in." Ew zat jî alîkarê Çillerê û herwiha Serokê SHPê, Murat Karayalçın bû.


Ji bo sosyalîstbûna xwe jî, qanûna ku ji bo bacê (vergi) deranîne, nîşan da. Mumtaz Soysal jî bi kemalistbûna xwe, xwe sosyalîst didît. Hûn dibêjin Çillerê sosyalîstê jidil an jî yê sexte berteref kiriye? Gelo li gorî we kîjan sosyalîst e.



Murat Karayalçın



Mumtaz Soysal



Erdal İnönü

Hinek dibêjin "Ne sîr e û ne pîvaz e, qeda li dermanê germ bikeve." Ez jî dibêjim. **ISKANÊ HENÊ**

Perên te di bêrîka te de ne!

Rojekê li Behdînan li hêla Gevêrê (Yüksekova) bazirganek (tucar) diçe gundekî ku deynê xwe bistîne. Diçe mala wî kesê ku deynê wî li ser e. Rûdine, nanê xwe dixwe, çaya xwe vedixwe û piştî re li kevaniya malê dipirse: "Xwişka min xwediyê malê li ku ye?" Jinik dibêje: "Birayê min, xwediyê malê ne li mal e. Çûye Îranê, wê qaçaqçîyan derbas bike. Ji te re rastî yê bibêjim wê dereng be." Zilam dibêje: "Deynê min li ser mîrê te heye, ez ji bo wê yekê hatime." Jinik bi hemû fenekiya xwe (bi qurnazî) dest pê dike: "Birayê min, xwe qet neêşîne, ew tiştê ku tu jê xembar dibî pir hêsan e. Hemû payizan koçer ji

hêla Botanê tînin û jin û pîr û zarok bi hev re pezên xwe derbasî welatên germ dikin. Dema ku birên (komên) pezê wan di van zinar û robaran re derbas dibin, hiriya wan bi teraş û giyandikeve. Ezê wê hiriye berhev bikim, bi teşîya xwe birêsim, risî bi-avêjim tevna xwe, berik (kilim) û xaliyên (mafûr) xweşik çêkim. Ezê wan berik û mafûran bibim nava sûka

(çarşî) Gevêrê bifiroşim û deynê birayê xwe yê delal bidim."

Zilam bi hers dikeve û ji hers û kerba xwe dikene. Jinik li zilam mîze dike û dibêje:

"Hey ez qurbano! Te pereyên xwe di nava destê xwe de dîtin. Tu çima nakevî mîro."


SILAHEDDÎN ÇULEMÊRG



Nirxandinek li ser Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst a ku piştî 70 salên din hilweşiya:

Heta rûyê erdê bibe yê ked û kedkaran...

Piştî 70 salan ku Şoreşa Kewçêrê ya Mezin xwe teslîmî dîrokê kir, hîn jî îdealên wê diçûrisin. Di roja me de bi qandî rexnekirinê tişteki hêsan nîn e. Divê ku dema ev maf tê bikaranîn, şert û mercên demê jî neyê jibîrkirin.



Tevî hev bû heftê û du sal, ew tiştên ku hatin jiyandin. Ne hindek e, nêzikî sedalekê ye.

Ne tenê di dîroka karkeran de, di ya hemû bindestan de ev qewimîn wekî rûknekê mihîm e. Gelê Rûsyayê vê rojê, tavê bi awayekî din dîtîn. Şerê hundirîn hatibû qedandin û şoreşa gelan dihat xemilandin.

Komarên (cumhuriyetên) federatîf ên sosyalîst di 30.12.1992'an de qerarê yekîtiyekê standin. Biryara "Yekîtiya Komarên Sovyetê yê Sosyalîst." Piştî 70 salan ku Şoreşa Kewçêrê ya Mezin xwe teslîmî dîrokê kir, hîn jî îdealên wê diçûrisin. Di roja me de bi qandî rexnekirinê tişteki hêsan nîn e. Divê ku dema ev maf tê bikaranîn, şert û mercên demê jî neyê jibîrkirin. Dîsa divê bê gotin ku her tişt, bi şertên ku pê hatiye afirandin, xwedî mane ye.

Di van salên dawî de gelek kesî dest bi rexnekirina sistema sovyetê kirine. Di nava van de kesine jî sosyalîstên berê jî hene. Di vê rewşê de defa cengê ya împeryalîzmê xwedî cîhekî girîng e.

Di hîm û rastiya xwe de, nexweşîna ku ji demeke dirêj ve di modela sovyetê de peyde bûbû, bi Gorbaçov re mir

û çû gorê. Pişt re hemû tiştên ku dişibîyan wî jî, bi xwe re birin.

Gelên Komarên Sovyetê yê Sosyalîst piştî ku bi awayekî lezgînî ber bi aliyê ramanên kapîtalîzmê ve çûn û hovîtiya vê sistemê dîtîn, hîna jî îdealên sosyalîzmê fêhm kirin, serwest bûn.

Her çi qas sosyalîzma berê ew dîlşad nekiribin jî, qet nebe şeref û heysiyeta wan parastibû. Lê kapîtalîzmê ev jî, ji navê hilanîn.

Dema ku hesab bê kirin, wê bê dîtîn ku rewş ji kewçêra sala 1917'an xerabtir bûye. Hovîtiya sermayeyê qat bi qat zêde bûye. Sistema Sovyetê, di gel "Kongreya Amerîkayê", "Kamaraya Lordan" û meclîsên kapîtalîstan ku tê de rezaletên mezin di-qewimin, wekî şîr spî û paqij dimîne.

A muhîm ew e ku sistema Sovyetê bi awayekî zanistî (ilmî) were vekolandin û nirxandin.

Pêlên ked û emekê tim pingar dane û niha jî pingar didin. Ev rewş wê her berdeyam be, heta ku rûyê erdê bibe yê ked û emekê.

Sîstemê çi anî û çi bir?

1. Îspat kir ku kedkar jî dikarin dewletê îdare bikin
2. Îspat bû ku

bêyî kotek û zorê îktîdar nayê standin

3. Hemû bindest bi tenê dikarin di bin îktîdara kedê de azad bibin

4. Şertê herî pêşî yê xwedî îktîdarbûyîne, xwe bi rêxistinkirin e

5. Kiriye ku sistema kapîtalîst xwe nêzî miroviyê bike

6. Di ekonomiyê de mûcizyek pêk anîye, lê dawîya wê nehatiye

7. Di perwerdehiyê de serketinên mezin bi dest hatine xistin

8. Bi hindikî be jî, kiriye ku mirov hîn bêhtir bi hereket û çeleng bin.

1. Sîstemê burokrasî û militarîzm kêmkirine, zêde kirine

2. Demokrasiya sosyalîst saz nekir

3. Çanda şoreşgeriyê neafirandiye û her wiha wî exlaqî çênekirîye

4. Ji ber girêdana bi "dayîk niştiman" ve enternasyonalîzm neaniye pê

5. Ji ber "îhrackirina şoreşê" xetayên mezin hatine kirin

6. Ilm nekiriye bin xizmeta hilberandinê, bidestxistina mehsûlan

7. Guhê xwe nedane sînyalên ku xetayên sîstemê didine nîşan

8. "Problema jinan" hel nekiriye.

EZNAS MAYA



Piştî mirina Lenin, Yekîtiya Sovyetê jî hêdî hêdî ji armanca xwe dûr ket.



DI WARÊ PÊŞVEÇÛNA ÇAND, HUNER Û EDEBIYATA KURDÎ DE 94: SALA STANDINA

Li dinyayê di warê çand, huner û edebiyatê de gelek tişt çêbûn. Bêhejmar berhem hatin afirandin û hatin weşandin. Lê mirov ku destê xwe deyne ser wijdana xwe, nikare qala gelek tiştan bike. Rewşa gelê kurd, nemaze rewşa Kurdistanê, ji bo kurdan bûye mazereteke nebaş. Di gelek waran de em xwedî kêmasiyên mezin in, ev jî ji ber xemsarî û tembelîyan e. Lê li aliyê din dîsa jî em dikarin behsa lidarxistina çend faalîyetên 94'an ku hêjayî gotinê ne bikin: Mihricana Govend û Muzîka Kurdistanê, Vebûna Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, çalakiyên YRWK'ê, damezrîna Yekîtiya Mamosteyên Kurd, derketina rojnameya Welatê Me û xebatên amadekirina MED TV'yê.



Bi pêşengiya ERNK'ê li Ewropa çalakiyên çandî û mihricanên pir gur û geş hatin lidarxistin.

Ji bo gelê kurd saleke din bihurî. Li dinyayê di warê çand, huner û edebiyatê de gelek tişt çêbûn. Bêhejmar berhem hatin afirandin û hatin weşandin. Lê mirov ku destê xwe deyne ser wijdana xwe, nikare bibêje ku bi qasî warên din di warê çalakiyên çandî, hunerî û zimên de jî gavên mezin hatine avêtin. Rewşa gelê kurd, nemaze rewşa Kurdistanê, ji bo kurdan bûye mazereteke nebaş. Di gelek waran de kêmasiyên me yên mezin hene, ev jî ji ber fêrnekirina girîngiya vî warî, xemsarî û tembelîyan e. Mirov meroq dike gelo kurdan di nav sala 94'an de çend berhemên tiyatroyê nivîsandin û çend heb ji wan di sahneyan de lîstin. Eynî tişt jî bo afirandina berhemeke sînemayê, ji bo muzîkê, ji bo hunereke xweşik, bi dilekî rehet dikare bê gotin. Ji bilî van tiştan, gelo kurdan di jiyana xwe ya rojane de çi qas zimanê kurdî bikar anîn, an jî gelo wan ji boku zarokên xwe hînî zimanekî biyan bikin, çi qas wext serf kirin? Gelo çend kes di vê sala çuyî de fikirî ku zimanê xwe wekî rûmeta xwe şanî gelên dinyayê da?

Di sala 94'an de qasî ku em li Tirkiyeyê diza-

nin, pir kêr pirtûkên bi kurdî (ji salên din jî hindiktir) hatin weşandin, pir kêr berhemên tiyatroyê bi zimanê kurdî hatin sahnêkirin, di vê hêlê de pir kêr berhem hatin nivîsîn. Yanî ji aliyê afirandin, weşandin - belavkirin û haydarkirina berhemên çandî, hunerî û edebî me saleke bêber derbas kir. Helbet ne tevahî bêber bû sala çuyî. Geh li nav kurdên Ewropayê, ku haya kurdên Tirkiyeyê pir kêr ji van tiştan çêdibe, geh li derveyî Ewropayê gelek livbazî-aktîvîte pêk hatin. Kurdên Sûriyeyê, qasî ku me bihîst, bi Mihricanan û li gorî îmkânên xwe di vî warî de li berxwe dan. Têkiliyên Kurdên Îranê, ji ber rejîma Îslamî, bi dinyayê re hema hema tune. Çi li wir dibe û nabe, nayê bihîstin. Eleqeya kurdên Kurdistanê Başûr, ji ber şertên ku di nav de ne û ji ber şerê birakujîyê, pir ne li ser çand, huner û edebiyatê ye. Wek li jor jî hate gotin, gelek tişt çêdibin, lê ji aliyê gelek kesan ve nayê bihîstin. Dîsa jî çend tiştên hêjayî gotinê ku em dikarin wek nimûne nîşan bidin: Mihricana Govend û Muzîka Kurdistanê, Vebûna Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, çalakiyên YRWK'ê, da-

mezirîna Yekîtiya Mamosteyên Kurd, derketina rojnameya Welatê Me û xebatên amadekirina MED TV'yê.

Helbet gelek tiştên din yên gotinê hene. Bi kurtî nîrxandina sala 94'an bi vî awayî dikare bê nivîsîn. Em dikarin temeniyên xwe ji bo sala 95'an bikin û bibêjin me sala 94'an, bi hêviyan emaniya sala 95'an kir.

Çalakiyên YRWK'ê û Enstîtuya Kurdî yên 1994'an

1- Meşa Azadiyê ya YRWK'ê

Bonn- Bruksel
24.12.1993- 05.01.1994
(150 rewşenbîrên kurd û biyan beşdar bûn)

2- Damezirandina şaxê YRWK'ê li Hollandayê

3- Damezirandina Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)

4- Vekirina Enstîtuya Kurdî li Berlînê - 22.04.1994

5- Çêkirina konferansên hemû şaxên YRWK'ê (Swêd, Frense, Berlin, Hamburg, Avusturya)

6- Serdana Vatîkan û hevdîtina bi Papa re-28.09.1994

Heyeta YRWK'ê ji Şerîf Wanly, A. Durre, Dilbixwîn, M. Emîn Pencewînî pêk hatibû.

7- Semînerên çandî, hunerî, sempozyûmên Köln, Bern, Zürich û Stuttgartê.

8 Mihricana Govend û muzîka Kurdistanê

9- Konferansa YRWK- 4 (18.19. 1994- Köln)

10- Konferansa Çand û Hunera Kurdî (1-3. 07.1994 Maas-tricht)

11- Semînerên li ser dîroka Kurdistanê (Prof. Hasretyan, Prof. Kinyaz İbrahim, Yalçın Küçük, Ş. Wanly)

12- Konferansa Mosko (24-25.11.1994)

(Enstîtuya Kurdî- Enstîtuya Rûsyayê ya Rojhilatnasyê)

13- Tevlîbûna konferansa Kurdistanê li Norweçê- Şerîf Wanly

14- Beşdarbûna Konferansa Kurdistanê ya navneteweyî li Bulgaristanê (Ş. Wanly)

Çalakiyên NÇM'ê yên 1994'an

19'ê adarê, Şaxa NÇM'ê ya İzmirê vebû.

Di Newrozê de turne (İzmir- Edene)

20-27'ê avrêlê, pêşangeha zarokan

29'ê Tîrmehê, Muzîkala zarokan " Ji Dinê re



94'AN BERNAMEYEKE FIREH Û GIRAN DANÎ BER DERIYÊ 95'AN

QERARAN



Di dema mihrcanekî de folklorvanên welatparêz çanda kurdî bi Ewrûpiyan dan nasîn.

Aştî"yê list.

30'yê Tîrmehê, Yekitiya Malbatên Mezopotamyayê ava bû

Rezber Panela F. H. Sağmıç li NÇM'ya Edenê li ser zimên çêbû

18'ê rezberê, pêşangeha pişeyên destan yê folklorîk vebû.

19'ê rezberê Li NÇM'ya Îzmîrê pêşangeha Fevzi Bilge dest pê kir.

20'ê rezberê ' Hefteya Bîranîna Musa Anter'

20'ê kewçêrê, Bîranîna Cîgerxwîn

29'ê kewçêrê, Kermesaya Yekitiya Malbatên Mezopotamyayê

29'ê kewçêrê turneya şanoya "Dengê Gel" ya NÇM'êşaxê Amedê (Stembo- Îzmîr- Edene)

10'ê berfanbarê, Li NÇM'ya Îzmîrê pêşangeha zarokan û çalakîyên mafên mirovan.

12-19'ê berfanbarê, ji aliyê NÇM'ê û YMM'yê piştgiştina rojnameya özgür Ülkeyê

Ji bo 95'an de çalakîyên

Yekitiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK)

Akademiya Çand û Hunera Kurdî

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM)

Enstîtuya Kurdî-Berlin

Enstîtuya Kurd-S-tenbol

Li Ewrûpayê

Di sala 1995'an de konferansa Çand û Hunera Kurdî ya Duwemîn (Cih: Almanyaya, Berlin. Dem: Sermawez, 1995).

Wergerandina pirtûka "Mêjûyê Wêjeya Kurdî" ya Sadiq Baha-addîn, bo tîpên latînî.

Ji bo avakirina Muze-ya Şoreşa kurdî xebat.

Derxistina Kataloga Bajarên Kurdistanê.

Derbarê wêjeya Kurdî de

Bi konferanseke fireh (Konferansa Ehmedê Xanî, Cih: Frensa, Paris. Dem: 15-17.09.1995) Îlankirina sala 1995'an wek sala Ehmedê Xanî.

Di konferansê de belavkirina "Xelata Ehmedê Xanî".

Ji nû ve çapkirina berhemên Ehmedê Xanî.

Derxistina pirtûkekê li ser Ehmedê Xanî.

Têkilî bi sazîyên zanistî û kulturî, nemaze bi UNESCO'yê re danîn.

Li darxistina Konferansa Wêjeya Kurdî ya Neteweyî (Cih: Swêd, Stockholm. Dem: 21-23.04.1995).

Derbarê zimanê Kurdî de

Li darxistina Konferansa Zimanê Kurdî ya Navneteweyî (Cih: Almanyaya, Berlin. Dem: 68.01.1995).

Ji bilî kurdan zimanzanên biyanî jî yê ku li ser zimanê kurdî xebitîne beşdar dibin.

Vekirina kampanyayekê ji bo xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî.

Derbarê diroka Kurdistanê de

Li darxistina Konfe-

ransa Dîroka Kurdistanê ya Navneteweyî (Cih: Swîsre, Lozan. Dem: 22-24.07.1995).

Di vê Konferansê de ji bilî dirokzanên kurd, dirokzanên biyanî yê li ser diroka Kurdistanê dixebitin jî, beşdar dibin.

Derbarê muzîka Kurdî de

Li darxistina konferansa muzîka kurdî ya neteweyî (Cih: Almanyaya, Bonn. Dem: 10-12.02.1995).

Ji bo piştgiştîya bi Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê re, çekirina Konsereke Navneteweyî.

Ji bo avakirina Orkestraya Neteweyî xebat.

Xurtkirina têkilîyên di navbera hunemend û hozanên kurd de.

Derbarê Şanoya Kurdî de

Li darxistina Mihrcanaya Şanoya kurdî ya Yekemîn (Cih: Almanyaya, Hamburg. Dem: 24-27.03.1995).

Li darxistina Konferansa Şanoya kurdî, wê di dema Mihrcanê Şanoyê de pêk bê.

Teşwîqkirina nivîsandina senaryoyên şanoyê.

Ji avakirina Konser- vatuaraya şanoyê xebat.

Derbarê sînemaya kurdî de

Her sal lidarxistina

Hefteya Filmên kurdî. Di wê hefteyê de hilbijartina filma herî ciwan û baş, dayîna xelatekê ji bo wê filmê.

Xurtkirin û bipêşxistina çekirina filmên kurdî.

Derbarê Wênegeriya kurdî de

Xurtkirin û pêşdexistina têkilîyên di navbera wênêkêşên kurdî de.

Vekirina Pêşengehên wênayan.

Ji bo pêşdexistina vê hunerê alîkarî û piştgiştîya wênêkêşên kurd.

Derbarê Folklorê Kurdî de

Ji bo afirandina berhemên folklorî yê nû alîkarî û piştgiştîya pi-porên vê hunerê.

Derbarê Çanda Nete- weyên li Kurdistanê de

Parastina çand û hunera neteweyan din ên li Kurdistanê dijin.

Xurtkirina têkilîyên di navbera çand û hunera kurdî û yê neteweyên din de, ku li kur- distanê dimînin.

95'an de çalakîyên NÇM'ê li Tirkîyeyê

-Di dawîya rêben- danê de li ser Ehmedê Xanî konferanse


-Di 4'ê rêşemiyê de Şahiya folklorê Mezo- potamyayê

Di 20 û 21'ê rêben- danê de Muzîka Zarokan "Ji Dinê re Aştî"

SUUT KILIÇ



Di nav çalakîyên NÇM'ê de şano, cihekî girîng girt.



Di zimanê kurdî de peyvên jin û jîn; mêr û mirin pir dişibin hev. Îro tiştê guheriye ew e ku jin û mêr herdu jî hewl didin da ku mirina ku ber bi wan ve tê tamdan veguherînin jînê.

Di heftiya dawî ya sala 1994'an de, dinya sar, lê şerê li Kurdistanê germ bû:

Li Çiyayê Cûdî gerîlayan helîqopterek daxistin

22.12.1994

Li culemêrgê, li ser Pira Erzîkê erebeyek leşkeran wergeriya, 3 leşker birîndar bûn.

Li gundê Şkeftan, ku li ser Hezroya Diyarbekirê ye, di navbera cerdevanan de şer derket, cerdevanek mir.

Li Diyarbekirê, li semta Bağlarê, mirovek (Vedat Tellan) hate kuştin. Tê gotin ku, Vedat Tellan alîgirê Hizbullahê ye. Kuştina Vedat Tellan kesi hilneda ser xwe.

Riya Diyarbekir û Çewlikê (Bingolê), ji ber êrişên gerîlayan ji aliyê hêzên dewletê ve hate girtin. Erebe di ser Elezîzê re diçin çewlikê.

Kesinen nenas û leşkeran li Cizîrê li hev xistin. Di lihevixistinê de ew 3 kes mirin û 3 polis birîndar bûn.

Gerîla û leşker li Hezxa Mêrdînê şer kirin. 3 leşker mirin û 2 leşker ji

birîndar bûn.

23.12.1994

Gerîlayan li navbera navçeyên Hênê û Licê cerdî ser leşkeran kirin. Di cerdê de 4 leşker mirin û gelek cerdevan ji birîndar bûn.

Leşker li gundê Girhebeşa Farqîna Amedê ketin kemîna gerîlayan. Li gorî gotina gundiyan, ji leşkeran mirî û birîndar gelek in.

Li Erzînganê, li newala Sansayê, leşkeran û gerîlayan şer kirin. Di şer de 2 leşker birîndar bûn.

Di navbera gerîlayan û leşkeran de, li gundê Demirci yê Wêranşara Ruhayê şer derket. Di şer de polis û gerîlayek mirin. 4 leşker û polisek ji birîndar bûn.

Hêzên dewletê du timên taybet bi mirî û 4 tim ji bi birîndarî anîn Nexweşxaneyê Tibê ya Universîteya Dicleyê.

Erebeyeke cerdeva-

nên gundê Bizinan ku li çiyayê Gebarê ye, li mayîna gerîlayan leqitî. 7 kes mirin, 6 kes birîndar bûn.

24.12.1994

Li Mêrdînê, li Dêrika Çiyayê Mazî, li gundê Tehtêsor di navbera gerîla û leşkeran de şer derket. 6 leşker û 2 gerîla mirin.

Gerîla girte ser gundê Zoxbirîna Hezroyê ku gundê cerdevanan e. Di êrişa gerîlayan de 5 cerdevan û 3 leşker mirin.

Boriya petrolê ya ku di navbera Misirca Sêrtê û Bismila Diyarbekirê re dibore, ji aliyê gerîlayan ve hate bombekirin.

Li hêla Gevêrê 250 malan ji ber pesta hêzên dewletê û şewtandina gundan, koçî Kurdistanê Başûr kirin.

25.12.1994

Li Diyarbekirê, li navbera Pasûr û Farqînê, di nav gerîla û leşkeran de şer qewimî. Di şer de 3

leşker mirin, 4 leşker birîndar bûn.

Li Stenbolê, li Şirinevler û Gaziosmanpaşa bombe teqiyân. MLKP'ê Ev livbazî hilda ser xwe.

Li Qosera (Kiziltepa) Mêrdînê û li gundê Koca ku girêdayî Êlihê ye, 2 kes winda ne.

26.12.1994

Çiyayê Cûdî, 23' yê berfanbarê ji aliyê hêzên dewletê ve hate bombekirin. Gerîlayan bi doçqa û roketan helîqopterek daxiste xwarê.

Li Qubîna Êlihê, di navbera leşkeran de şer derket. 2 leşker mirin, gelek leşker ji birîndar bûn.

Li mintiqeya Misirca Sêrtê, gerîlayan li gelek deweran kemîn avêtin pêşiya leşkeran. Di kemînan de 8 leşker mirin, 2 leşker û serbazek bi xedarî birîndar bûn.

27.12.1994

Erebeyeke leşkeriyê li

merkeza Amedê ji aliyê gerîlayan ARGK'ê ve hate gulebarankirin. 2 leşker mirin, di heqê birîndaran de saloxî bi dest neket.

Gerîlayan avêt ser Qereqola Wezrika Mêrdînê, di heqê mirî û birîndaran de agahî nîn e.

Cendekê 3 leşkeran bi awayekî qerisî li Pasûra Amedê, li çolê hate ditin. Gundiyan herêmê dibêjin ku mirî gelek in.

Li Hezroya Amedê, gerîlayan kemîn avêt pêşiya cerdevanan. 2 cerdevan mirin.

Gundê Ceznê ku li ser Êlihê (Batmanê) ye, ji ber qebûlnekirina cerdevanîtiyê, ji aliyê hêzên dewletê ve hate valakirin.

28.12.1994

Li nêzikî Licê, gerîlayan êrişê konvoya leşkeran kir. Di êrişa gerîlayan de 4 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn.

Operasyonên hêzên

dewletê li çiyayê Agirî, Tendûrek û Çemçê didome. Roja 24'ê berfanbarê li mintiqeya Çemê Çeto di navbera gerîlayan û leşkeran de şer qewimî. 2 leşker mirin, gerîlayek ji bi birîndarî ke-te destê leşkeran.

Li Rûhayê, li Sêwrekê, di nava cerdevan û gerîlayan de lihevixistinek çêbû. 4 cerdevan mirin.

Bûroya Sekreterê Şubeya Mafên Mirovan ya Stenbolê, Ercan Kanar ku Li Aksaraya Stenbolê bû, hate bombekirin.

Li Wanê, li Başkalê, leşkerek tecawûzî keçe-ke dîn kir. Bapîrê keçikê, leşker û keçik kuşt.

Li Cizîra Botanê, 4 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatine girtin, lê hêzên dewletê girtina wan qebul nake.

Derdûka Stewra Mêrdînê ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin.

Navenda Nûçeyan

Xebatek li ser paşgîrên di kurmançî de (2)

TERKÎB Î PASGÎR TÊNE TEVLÎHEVKIRIN

Pîştî ku paşgîrên di xebata Celadet Bedirxan û Rager Lescot de hatin daxuyandin, îcar min divê ku ez werime ser Ferhenga D. Îzoli. Di ferhengê de Îzoli beşek ji rêzimana kurdî re veqetandîye û li ser vî mijarê nêrîn û ramanên xwe pêşkêş kirine.

2. Di Ferhenga Îzoli de paşgîr: D. Îzoli di vî berhemê de, 78 qertaf wekî paşgîr nîşan dane. Lê ji wan 26 lib ne paşgîr in. Yek jê jî, bi soranî ye.


Li gorî rêza alfabeyê paşgîr ev in: a, ahî, ak, al, ane, anî, ar, asî, ban, bar, baz, bend, ber, dank, dar, e, ende, fam, gar, gaz, geh, gîn, gon, ik, istan, î, in, inî, itik, kar, ker, lan, mal, mend, nak, ng, ok, ole, olek, olik, onek, oyî, perwer, tî, ûr, van, war, wer, wî, xane, yar.

Ên ku ne paşgîr in: an, atî, awer, bare, dêr, dox, ger, gîr, gir, hî, î-nok, îr, îtî, îyan, kok, lîn, niwaz, oke, ol, reng, sar, tir, vanî, ver, yî, za.

Di nîrxandina li ser berhemê C. Bedirxan û R. Lescot de ji bo "an", "awer", "bare", "îr", "reng", "sar", "înok", "dêr", "dok", "vanî", "ver" îzehet hatin dan.

atî û îtî: mirovati, hemberîti, pismamti... Her wekî ku xuya dibe, qertafên "atî", "îtî" û "tî" yek tişt e û eynî maneyê didin. Ji kokekê tî û li gorî peyva ku werine paşîya wê dengdêrekî dikare bikeve pêşîya qertafê.

îyan: Ji bo vî nimûneyên "germiyan" û "sermiyan" hatine pêşkêşkirin. Carek "îyan" "an" bi xwe ye û qertafa piraniyê ye. Ji ber ku du dengdêr nayêne ba hev, herfeke bîdeng (y,h,w) dikeve navbera wan. Ji wan re herfên pêwendiyê, kelijandinê tê gotin. Heke em bîne ser wan peyvên; "germiyan" hem navê êlekê û hem jî ya herêmekê ye. Di vî peyvê de "germ" kok e, "î" qertafa mensûbiyetê û "an" jî ya piraniyê nîşan dide. Ku em peyva "sermiyan" jî ji hev derxin; "ser mî an" dertê rastê û peyveke he-



Zimanzan û Kurdolog Qanatê Kurdo

vedudanî ye.

ger, gir, gîr û za: Ev herçar jî, ji raweya fermanî ya lêkerê tî. Ji bo nimûne: masîgir, birazî (biraza), şevger.

Dixwazim li ser peyva "kelegîr"ê bisekinim. Îzoli ji bo qertafa "gîr"ê ev mînak nîşan dane. Baş tê zanîn ku ev jî peyv û pêşgîrê çêbûye û rengdêr e. Ji bo nimûne: Keleşêr, kelekôr û hwd.

hî û yî: Qertafên me yên wisa nîn in. Heke em ji wan re nimûneyên ku Îzoli bi xwe daye, bidin: avahî, agahî. Di herdu mînakên de jî bi hêsanî dixuye ku qertaf "î" ye. Ji bo "avahî": kok "ava" ye, "h" herfa kelijandinê û "î" jî qertaf e. Em bîne ser peyva "agahî". Kok "agah"ê û "î" jî di-san qertaf e. Ji "yî"yê re D. Îzoli "bêpareyî" mînak nîşan daye. Di vî de jî "î" qertaf e û herfa "y"yê jî peywira kelijandinê tîne cih.

kok: jê re vî peyva "çilokok" wekî nimûne nîşan daye. Tê dîtin ku peyv ji "çil", "ok" û di-san jî "ok"ê pêk hatiye. Qertafeke wisa nîn e.

lîn: Ji vî re jî peyva "hêlîn" nîşan daye. Heke peyvîne din jî rayî me bî-kira me dikarebû li serê fikra xwe bigota. Lê bîlê pir xweş diyar e ku

"hêlîn" navekî xwerû ye. Dîsan jî mirov zorê bide xwe dikare vî navî wiha jî hev derxe: "Hêlîn". Wê gavê dikare bî gotin ku qertafeke bi navê "în"ê heye.

Niwaz: Dilniwaz. Ev jî du peyvên çêbûye û terkîb e.

oke, ol: Îzoli ji bo "oke"yê peyva "banoke"yê daxuyandiye. Jixwe peyv carek bi paşgîra "ok" û pişt re jî bi "e"yê pêk hatiye. Ji bo "ol"ê jî "gûlor" nîşan daye. Li ser vî nimûneyê bîdijwarî tê dîtin ku qertaf "or" e, ne "ol"ê.

tir: mezintir, biçûktir. Rind diyar dibe ku ev "tir" rewşê derdibe, qiyastiyê dide xuyan. Têkilîya wê bi paşgîrtiyê nîn e.

ayetî: Ev paşgîr jî zaravayê soranî derbasî nava kurmançiyê bûye.

Min divê ku ez li ser paşgîra "asî"yê jî rawestim, ji ber ku Îzoli jê re peyva "mêrxasî"yê wekî nimûne daye nîşan. Peyv ji "mêr", "xas" û "î"yê pêk hatiye. Ji bo paşgîra "asî"yê mînak: Tengasî, kurtasî...

3. Di Gramera zimanê Kurdî ya Q. Kurdo de paşgîr: Prof. Qanatê Kurdo di vî kitêba xwe de 39 qertaf wekî paşgîr radixe ber çavan. Ji wan du heb ne paşgîr

in, yek jê jî bi tirkî ye. Ji çar paşgîran re jî nimûne nedane. Ji lew re der barê wan de min ramanek danexuyand.

Li gorî rêza alfabeyê paşgîr: ane, ahî, anî, ar, ayî, baz, bend, dang(k), dar, ek, gar, ge(h), ik, (i)stan, î, in, k, kar, kî, kîng(?), lan, mend, ng, ok, saz, tî, war, wer, wî, van, yar, xane.

Ên di kevanê de jî aliyê min ve hatin danîn, ji ber ku kêman bûn. Li ser paşgîra "kîng"ê ku ez gumandar bûm, min ev nîşana pîrsê kîre nava kevanê.

Qertafên "dan" û "em" ne paşgîr in. Ji bo "dan"ê nimûneyên kevçîdan, kadan, kildan nîşan dane. Ji şîrovekirina vî yekê re ne hewce ye ku gotin bî derîjkirin. Diyar e ku paşgîr di rastîya xwe de "dank" e. Ji bo "em"ê jî ev bî hêsanî dikare bî gotin ku rêza tişteki dide xuyan û bi soranî ye. Ji bo nimûne: Kesê duyem.

Ji paşgîrên "in", "la", "um" û "tank"ê re qet mînak nedane. Em jî bi şeweyê zanistî nikarin li ser wan gotin bibêjin.

çî: Xebatçî, zirneçî... Ev paşgîrê tirkî ye.

4. Li gorî A. Balî paşgîr: Di kitêba xwe ya Rêzimana Kurdî de 31 paşgîr tespît kirine. Ji sê heban re nimûne nedaye, yek ne paşgîr e û yek bi tirkî ye. Li hêla dinê jî paşgîrê hatiye tekrarkirin.

Li gorî rêza alfabeyê paşgîr: ane, anî, ar, baz, bend, dank, dar, gar, geh, ik, (i)stan, î, in, k, kî, kîng(?), mend, ng, ok, saz, tî, war, wî, xane, yar.

Ji bo "kîng"ê min nîşana pîrsê danî, ji ber ku der barê wê de gumanên min hene, ji "stan"ê re jî min herfa "î"yê di nava kevanê de, da pêşîya wê.

Ji "din", "la" û "um"ê re tu peyv nedane nîşan. Qertafa "çî" bi tirkî ye. Li ser "dang"ê jî ku fikra xwe derpêş bikim; ev qertaf "dank" bi xwe ye.

dan: A. Balî vî wekî paşgîrê daye nîşan û jî bo nimûneyê jî peyva "gadan" daye. Qenc diyar e ku "ga" nav e û "dan" jî lêker e, ne paşgîr e.

ZANA FARQÎNÎ

DEFTER

Lehiya rizgariyê diherike

Gelê kurd li deştan, li çîyan, li gundan, li bajaran, li Ewrûpayê, li Asyayê, li Rojhilata Navîn û li her dera cîhanê serî hildaye. Ji koledariyê re, ji kedxwariyê re û ji pêkûtiya hezar salan re dibêje na... kurd êdî xwe baş nas kiriye, şiyar bûye...

Partiyeke wan tê girtin, yeke din saz dikin, roj-nameyêke wan tê girtin, ew yeke din derdixin. Ne gule, ne sator, ne bombe, ne kuştin, ne girtin, ne zîndan, ne macirtî (sirgûn), ne şewitandin, ne wêrankirina gundan, ne jî berzekirina mirovan nikare gelê kurd jî rîya rizgariyê dagerîne.

Belê, tu hêz nikare li pêşîya lehiya rizgariyê bisekine. Lewre ev lehi wekî ya adar û avrêlê (nîsanê) ye. Çi bi berkeve, wê bi xwe re dibe.

Bila ev jî bî zanîn ku, di sedsala bîstan de nijadperestî û barbarî nema tê parastin. Dewleta tirk li derve, nikare xwe biparêze, ji bo wezîriya karên derveyî nikare mirovekî/ê bibîne. Murat Karayalçın jî vî rûreşîya wê qet nikare biparêze. Kuştina ji 3000 zêdetir mirovan, şewitandin û valakirina gundan, di binçav de kuştina mirovan, kuştin û windakirina roj-namevanan, kuştina parlamentêran, kirinên kontrgerîla nayên veşartin.

Li Ewrûpayê jî qûş li wan teng bûye, di cîvînên saziyên navneteweyî de tîne rexnekirin. Biryar li

hemberî wan tê standin. Ji bo nimûne ku ez bahsa çend çalakiyan bikim: Di 12 û 15'ê berfêbarê de, li Strasburgê civîneke Parlamentoya Ewrûpayê çêbû. Em jî li wir bûn. Ji roj-namevan re jî civîneke çapemeniyê hate lidarxistin. Bi serokên gelek komîsyon û grûban re têkiliyên me çêbûn.

Roja 14'ê mehê saet li 15.00-16.00'an li ser meseleya kurd civînek pêk anîn. Ji ber ku axaftin bi zimanekî ku em pê bizanin bû, nehatin wergerandin, me nizanibû kî çî dibêje. Lê ji ber lîxistina çepikan me dizanibû kî li dijî dewleta tirk diaxive.

Di vî civînê de nûnerekî Alman destê xwe bi aliyê me de derîj kir û em bi beş-daran da nasîn, ku kesên li ser wan axaftin çêdibe, li vir in. Vê parlamentoyê hetanî niha sê biryarên li dijî Tirkiyeyê standine. Lê ya herî giran a vî carê bû. Her wekî Parlamentoya Ewrûpayê, Konseya Ewrûpayê, REHE (Rêxistina Ewlekarî û Hevkariyê ya ji bo Ewrûpayê) Yekîtiya Parlamentêrên Cîhanê, Yekîtiya Ewrûpayê û hwd. li dijî dewleta tirk biryar standin.

Ji bo gotina dawî ez vî bibêjim. Qanûneke xwezayê ye, her tişt dizê, dijî û dimire. Dewleta tirk divê ku vî yekê baş bizanibe.

NİZAMETTİN TOĞUÇ

Werin em sala 95'an bikin saleke xwerû bi kurdî! Werin em zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin!

Helbestvan û welatparêzê kurd Faîq Bêkes:

Sedsala bîstan e kurdino xîretek!

Li başûrê Kurdistanê li ser Faîq Bêkes ev tarîf tê kirin: "Bêkesê helbestvan û niştimanperwer." Belê, welatparêz e, lê bi şiyarbûn û agahî, bi awayekî zanistî li nik helbestê ye. Helbestvan ji me re dibêje ku mizgîniya serkeftinê di berxwedan û hewldanê de ye, ya koletiyê jî di rûniştin û bîdenmayînê de ye.

Qet mebejin: "Dij-min bihêz e, top û firokeyên wî hene", (ger) îtifaqa we hebe pir zehmet e, ew li ber xwe bide.

Di sala 1905'an de li gundê Sîtekê ku nêzikî Silêmaniyeyê tê din-yayê. Yek ji serkeşê Serhildana 6'ê Rêzberê (Îlonê) ye û tê de birîndar bûye. Di helbesta xwe ya navdar de wiha dibêje:

Ey weten meftûnî te me û suretê te hat bira min

Dema bendî û esa-

retê pê bi tewq û kot him-ve.

Bêkes di 18.12.1948'an de diçe ser dîlo-vaniya xwe. Piştî mirina wî, bi heftiyekê, fer-mana girtina wî ji aliyê dewletê ve tê derxistin.

Bêkes û helbestên siyasî

Li başûrê Kurdistanê li ser Faîq Bêkes ev tarîf tê kirin: "Bêkesê helbestvan û niştimanperwer." Belê, welatparêz e, lê bi şiyarbûn û agahî, bi awayekî zanistî li nik helbestê ye. Helbestvan ji me re dibêje ku mizgîniya serkeftinê di berxwedan û hewldanê de ye, ya koletiyê jî di rûniştin û bîdenmayînê de ye.

Lafî milliyet bidev, di vî esrê de fêdey nîn e.

Roja hewl e her bi



Faîq Bêkes

met guhê huner bi dest dixê."

Di vir de Bêkes bi awayekî vekirî rîya xebatê dide xuyakirin.

Herwiha dixwazê rê li

ber kesên reformîst bê girtin, ji lew re dibêje: "xebat kirin e, ne gotin e."

Helbesta "27 sal e"

E d m o n d s rawêjkarekî (musteşar) îngilîz bû. Di 1946'an de ji bo vegera wî ya Îngiltereyê şahiyek tê çêkirin. Di vî

d e Bêkes, bi amadebûna bi sedan kesan helbesta xwe ya "27 sal e"

dixwîne. Bi helbesta xwe rexneyan li Edmonds digire. Wê çaxê kêm kesan karibûne li hemberî wî gotinên asayî (rihet) bikin. Bêkesê welatparêz wiha deng li vî îngilîzî dike:

"27 sal in ez kedkarê

te me

Bi nan, av, cil û bergên xwe ve

Min xizmetê te kir li Îran û Romê

Lê hê jî dîl û ked bi xesarê me

Gunehê min çî bû te ev derd hanî serê min

Çima bineheqî te wisa ez sivik kirim..."

Her çiqas Bêkes ji welat û mîletê xwe hez kiriye jî, dîsa rexne li gelê xwe, li rewşa siyasî û civakî jî digire. Lewre dibîne ku gelê wî tiştek bi ser tiştekî nexistiye, hem jî di sedsala bîstan de.

Faîq Bêkes kûr difikire û dibêje:

"Sedsala bîstan e, kurdino xîretek

Ji xewnê rabin, hewlek hîmetek

Bes e nezanî, ilmek, senetek

Sivikbûnî heya kengê, navek hurmetek

Hizir û bîrên te hebin, peyayên jîr ên te hebin.

Di cihê serbestiyê de çima zincîrên te hebin?

Mil bi baskê nafire!

Di helbesta bi navê

Dara Azadiyê de ku bi boçûna (texmîna) pir kesan helbesta wî yê dawîn e, qala gelek tiştên girîng tê kirin. Ev helbest ji bo raperîna gelê Iraqê ya li dijî îngilîzan hatiye nivîsandin. Bêkes bi vî helbesta xwe hizr û ramanên xwe derdibe û ji bo serkeftina şoreşê çî pêwîst e wî tîne zimên:

"Dara azadiyê bi xwînê av nebe, qet biber nabe

Serxwebûn bîfedekariyê tu car çênabe

Mirov divê ji bo standina heqê xwe ji mirinê netirse

Bi dev rûxandina dij-min çênabe, heq tê standin nayê dayîn

Nêr û mê herdu bi hev re ji bo weten nexebitin

Dûr e xelasiya wê, mil bi baskê nafire."

Jêder: Dîwana Faîq Bêkes, Mehmedî Mela Kerîm amade kiriye, Pertûxaney Aso, li Kerkûk, 1980

SÎRWAN NANEREQ

Nûdem: Hejmara 12'an jî derket

Kovara Nûdemê, bi qedandina sêsalîya xwe ve, di gel hin guherînan hejmara xwe ya nû weşand. Nûdem ku weşaneke hunerî, çandî û edebî ye, li Swêdê xwerû bi kurdî derdikeve.

Xwedî û berpirsiyarê wê Firat Cewerî, di nivîsa xwe ya bi navê "Nûdema bû sê salî" de dadixuyîne ku wê hin guherînan di kovarê de pêk bînin.

Di hejmara 12'an de nivîsên teorîk, werger, çîrok, helbest, xebatên vekolînî û hwd. ji xwe re cih û şûn veqetandine. Ev hejmar ji bilî helbesta Mehabada Qeredaxî ya bi navê "Berd" gişt bi zaravayê kurmançî ye. Ji hêla din ve, di vî hejmarê de çav bi qelemên nû dikeve.

Navê hin nivîskar û nivîsên vî hejmarê: N. Zaxuranî "Rexne û Edebiyat", Firat Cewerî "Girtiyê



Berga hejmara nû ya Nûdemê

Şeva Reş (çîrok)", Mehmet Uzun parçeyek ji romana xwe ya ku hîn nehatiye çapkirin Bîra Qederê bi navê "Bedirxan; Mîrên Kurdan, Xwedanşan, Lê Bîndest", Zeynelabidin Zinar "Şêx Memdûhê Birîfkani" û wergerên ji Jack London, nameyên ku Kafka ji Milenayê re nivîsî bûn...


Nûbihara nû: Ji qencyê îstîfade dibe

Nûbihar, kovara çandî, hunerî û edebî ya mehane bi sernavê "Ji neqencyê sûtîstîfade nabe, lê ji qencyê sûtîstîfade dibe" silav da xwendevanên xwe.

Kovara xwerû bi kurdî ku li Stenbolê tê derxistin, di vî hejmarê xwe ya 26'an de, mijarine ji hev cihê jî rûpelên xwe re kirin mevan.

Bi sernavê xwe kovar dest davêje mijareke nû û deriyê gengeşiyê (muneqşeyê) vedike. Heke ji bo nimûne parçeyek ji nivîsê bê hildan: "Ji neqencyê sûtîstîfade nabe; lê belê ji qencyê sûtîstîfade dibe. Û ji ber ku dîn qencyek e meriv dikarin ji vî qencyê jî sûtîstîfade bikin."

Di vî hejmarê de hevpeyvîna ku bi gerînendeyê rojnameya



Kovara mehane Nûbihar


me re bûye jî, cih digire. Navên hin nivîs û nivîskarên din di vî hejmarê de ev in: Sabah Kara "Mersiyeyên Rojhilat", Ali Karadeniz "Yezîdî û Yezîdîtî", Cankurd "Silavek bo dost û yaran", Hayrullah Acar "Dilê min li welatê min veşêrin".

LI ASÎMANEKÎ BIYAN QÊRÎNEKE AZADIYÊ

P elên zer ên daran vir de û wê de ber bi ba dibûn. Darên ku bi hatina biharê xwe xemilandin, wekî mirovê hestîmayî, di bin bayên werzên mirinê de diricifîn. Darên şilf û rût mayî bi guliyên xwe yên bi çend pelên zer ên hişk, li ber xwe didan. Payîzê bi qêrîneke bêdeng a ji perpûlên berfa sermawezê, hêdika cihê xwe dida zivistanê. Mirina siruştî wekî marekî kor, îcar ne bi awayekî xwezayî, lê bi awayekî beravêtî bi ser ketibû.

Bayekî sar dihat. Ji mûyên serî heta hestiyên, mirov ji sermanan diricifîn. Di vê seqema sar de bêhna şewatê dihat. Li bin asîmanekî xerîb, li kêleka deryayeke qirêjî, perpûlên berfê bi xem dihatin xwarê. Dixwestin mirovahiyê ji agahiyeke nebixêr agahdar bikin. Lê tiştê ji dest nedihat. Bêzar û bêziman bûn.

Çend rojan berê, keriyê koremaran di bin serokatîya keftarekî boz û dîlegura ku ji devê wê girêza harbûnê diherikî, li hev civiyabûn. Rojekê bi şûn de dîlegura har li ser xwestina keftare boz û koremarên wî, yên ji devan xwîna mirovan diherikî ferman da. Ferman eşkere bû: "Dengê azadiyê bişewitînin", digot. Nivê şevê ji zû de derbas bûbû. Berfa spî hêdî hêdî reş dibû. Çilkên baranê wekî rişk û spîyan xwe berdidan nav xewnên mirovan. Hemû zindiyên mirov dinaliyan. Lê kesî hê jî nizanibû ka ji bo çi dinalin. Birûskan dixwestin bi şîrqîniya xwe mirovan şiyar bikin. Lê şîrqîniya wan jî tewş bû. Her kes di xewê de bû. Di xewa mirinê de... rane ketibûn. Li benda agahiya serkeftina koremarên xwe bûn. Koremaran wekî keriyekî li pey hev xwe berdan



kêleka derya qirêjî. Pêlên deryayê bi hêrs li kendalên betonî dixistin. Stêrkên deryayê li ser betona sar yek bi yek di devên koremaran de dixeniqîn. Tu yekê nikaribû xwe bigihîne Welatê Azad. Qîje qîja qulingan agir bi dilê deryayê dixist. Lê vê jî, rê li ber koremaran nedigirt. Koremaran hemû jehra di laşên xwe de valayî kêleka hêlîna azadiyê kirin û yek bi yek li dû hev vekîşyan qulên xwe.

Ji derketina rojê re, tenê çend saet mabûn. Jehra koremaran bûbû agirekî reş. Bi hêlîna Welatê Azad ketibû. Hemû zindî yên di postên mirovan de digeriyan, dest bi pîrozkirina şewitandina dengê mirovahiyê kiribûn. Bist

birîndar û pakrewanek wekî sorgulên çiyayî tirêjên ronahiyê didan tariya rojê. Ji çiyayên Welatê Azad, stêrka sor di demeke berbangê de, tirêjên xwe yên zêrîn ên rojê bi zimanê daristanên çiyayî hêşîn hêşîn berdan ser warê jiyane û ji kêleka Araratê pakrewan girtin nav tirêjên xwe. Her birîndarek bi sê plotiyên newrozî ramûsin. Vê ramûsandinê birîn xweş kirin. Pakrewan rîya wan ronahî kir.

Welatê Azad, bi hemû xweşikahiya xwe, dengê xwe bilindtir kir. Tenê zindiyên bêrûmet ên di diqlê mirovan de digeriyan di pîrozkirina şahiya xwe de, wekî her carê di pîrozkirina xwe de xeniqîn. Careke din pîrozkirina wan vegu-

herî xemgîniyeke bêhempa. Berfa zivistanê bi perpûlên xwe yên kevokî xwe dan ber bayê kur û bi gelê Welatê Azad re ketin go-venda jiyane. Wê rojê, li wê derê di nav berfa Agiriyê de sorguleke kurd, berfînekî azerî hambêz kir. Welatê Azad, hawarek ji dilê kurd ê, bi zimanê tirkî, li bin asîmanekî biyanî, li kêleka deryayeke xemgîn. Niha diwarên wê yên şewitîne hêz didin xebatkaran. Li nêzîkî qulêke koremaran...

Jêrenot: Ev nivîs li ser bombekirin û şewitandina Rojnameya Özgür Ülkeyê hatiye nivîsandin. Di şûna Özgür Ülke de "Welatê Azad" hatiye gotin.

ROJHAT AZADÎ

KELEPOR

Navê nexweşiya me çi ye?

Di hejmara Welatê Me ya derbasbûyî de, hevalê Amed Tîgrîs li ser bûyereke balkêş nivîsandibû. Rewşa xwendevan û abone-manên rojnameyê anîbû zimên. Ne tenê li Swêdê, ew rastî, li her devera ku Welatê Me digihîjê, dikare were dîtin.

Mirov çawa dikare rojnameyêke wiha nû, teze, bêîmkan ku, di nava hezar diwarî û aloziyan de derdikeve û li ser xwîna ciwanan dijî, bixapîne. Belê, ew kesên ku ev ji du salan zêdetir e Welatê Me ji wan re tê û buhayê abonetiye nedane, bila dilê wan nemîne, ew rojnameyê dixapînin. Ma çend rengên xapandinê hene?! Sedem çi ye? Li Ewropayê kesek nîn e ku nikaribe di 6 mehan de 60 Markî bide. Heke wisa be, reva ji 60 Markî tê çû wateyê!

Mirovê ku ji Stenbola, ku her roj rojnamevanên kurd lê tene kuştin, rojname ji wî re were, wê çima buhayê rojnameyê nede? Li aliyê din jî nikare Hürriyet û Milliyetê ji xwe qut bike. Sedem çi dibin bila bibin, mafê me kesekî nîn e em Welatê Me welê bêqîmet bikin. Ev ji aliyekî ve. Bêguman, ji aliyê berpirsiyarên rojnameyê ve jî kêmasî hene.

Kesekî ku ev du sal in buhayê abonetiye nade, hefte bi hefte rojnameyê digire, wê çima birêvebirên rojnameyê ji vê bûyerê ne agahdar bin? Yan jî kesekî ku ev du sal in bûye aboneman, wê çima rojname jê re neyê? Helbet bûyerên wisa hem xwendevanan, hem jî abone-manan dilsar dike. Rast e, xwendevan, nivîskar û kesên ku weşanên kurdî belav dikin û didin xwendin, hindik in. Guman di vê yekê de nîn e. Ne ji ber ku kurdî zor e, yan jî ne dewlemend e,



DILBIXWÎN

sedem ne ev e: sedema bingeîn di nêrîna min de em kurd hîna negihîştine wê radeyê ku bikaribin rûmetê bidin hebûna xwe ya neteweyî. Ne tenê ji bo rojnameya Welatê Me, ji bo hemû weşanên kurdî yên bi zimanê tirkî, erebî... derdikevin jî ev rastî eşkere ye. Bi sedsalan e, di jîmanan di nava me de nexweşiyeke wisa belav kirine. Dema ku ev hesta neteweyî zêf be, wê demê gelek rê li pêşîya behaneyên wiha jî vedibin: "Ji min re Welatê Me neynin, ez bi kurdî nizanin bixwînim... ji min re Berxwedanê neynin, ez bi zimanê dijîmanan naxwazim weşaneke kurdan bixwînim... Dengê Kurdistanê nêzîkî min nekin ez bere dizanim, min tetmîn nake... Zimanê ereban ne zimanê me ye." Helbet di rewşeke wiha de wê Welatê Me jî hindik were xwendin û belavkirin. Mirov gelekî diêşe. Berê her kes bi hesreta derketina rojnameyê kurdî bû, ev e derket. "Ez bi kurdî nizanim", tu caran nabe bahane û nabe çare. Eger ez bi kurdî nizanibim gerek e ez xwe fêr bikim, ne tenê fêrkirin, ezê bi xwe re gelek bidin fêrkirin jî, ev bi serê xwe wezîfeyek e. Bila kesek şaş tenegehîje, ev ne aqilmendî ye, ne ku aqilekî didim xwendevanan, lê belê ez diêşim. Rewşeke kam-bax e, em hemû di nava wê rewşa kam-bax de xwe dibînin. Komplekse heye, bûye nexweşî. Gelo emê kengê ji wê nexweşiya giran xelas bibin û hinekî bi ser xwe ve werin?!

Sersala we pîroz be!

Zarokên şîrîn û delalî! Ser-sala we ya 95'an pîroz be. Ev sal ji bo kurdan saleke pir girîng e. Çunkî 95 ji bo me sala Ehmedê Xanî ye. Hûn zanin Ehmedê Xanî şair û nivîskarê kurdê pir meşhûr bû. Wî berî sê sed salan destana Mem û Zînê nivîsandibû.

Ez dikarim di hejmareke din de ji we re behsa Ehmedê Xanî bikim.

Vê heftiyê hevalêke we nivîsek ji bo sersala kurdan şandiye. Navê hevala we Rojbîn e. Hûn vê nivîsa wê hemû bixwînin.

Careke din sala we ya nû pîroz be. Ji bîr nekin, ji min re name, çîrok û resiman bişînin.

MAMOSTE
ZOZAN

Îşev, şeveke sar e. Kuliyên berfê wek gulokên pembo li hewa difirin. Gur û keftar belkî ji çiyê daketibin, li nav malan digerin. Gelo niha hevalê min Azad li mal çî dîke, ew jî wekî min ji keftaran ditirse? Do bi şevê hinekan li deriyê me xist. Heta me derî vekir, ew kesê hatibû, zû winda bû. Diya min ji min re got ew kalîkek e, her serê salê ew geştan ji hemû zarokên dinyayê re dibe malên wan. Gava min li geştê (diyariya) xwe nihêrî, ez bi xwe şiyar bûm ku ew xewneke. Diya min ji min re got: "Divê tu razê, ji bo ku îşev ew bi rastî bê û diyariya te dîne ber derî." Ez niha berê xwe didim nav ciyan û li benda kalîk im. Min navê xwe ji bîr kir, Rojbîn. Merheba hevalno, sala we hemû zarokan pîroz be.

Zarokno, sersala we ya îsal pîroz be!

De ka werin em bi hev re derkevin nav malan û bistrên:

Serê salê
Binê salê
xwedê kurkî
Bide vê malê
yek din jî:
Serê salê
Binê salê

Sala nû ken li rû mizgîn diyarî bû

Kal qurbana
Xortê malê

Wekî din jî gelek he-
ne ha:

Qerqûş merqûş
Kanî das ez herim pûş

Xwedê kurkî bike der-
gûş

Para min kakil û mewîj
û yeke din jî:

Serê salê pif kere pif
Binê salê pif kere pif

Du nêrî du bizin
Jina kalo xweş bigrin
dîlanê

Gelo hûn hîç fikirîne
ku kurd sersala xwe ça-
wa pîroz dîkin. De we-



rin em bi hev re bixwî-
nin: Sersal, roja New-
rozê ye. Yanî 1'ê adara
kurdî ye. Yekê adara
kurdî, piştî 21 rojên a-
dara mîladî ye.

Îcar pîrozbahî çawa
çêdibin: Ji çarşema da-
wiya reşemiyê (sibatê)
heta çarşema serê a-
darê ye. Bi şev li çiyar
agir dîkin. Kalekî çêdi-
kin, navê kal Tajdo ye.
Ser mil û piyê wî bi pa-
çikan dipêçin. Yanî
Tajdoyê me dibû însa-
nekî ecêb. Xort û za-
rokên gund, bi Tajdo re
alaya fenerê çêdikirin û
di destê wan de yel-
mûm (meşhale) û dige-
riyan. Kevaniyên gelek
malan carinan wek qe-
reçiyar, av davêt ser a-
laya fenerê û ew şil di-
kirin. Lê wan dev ji pî-
rozbahiyê bennedidan
û ew mal bi mal li geştê
xwe digeriyan.

Îcar em werin ser
sersala Noelê: Noel, ro-
ja bûyina Hezretî Îsa, di
24'ê berfanbarê (meha
11) ye. Filleh, her sal vê
rojê wek salvegera sale-
ke nû pîroz dîkin. Kali-
kekî wan jî heye û navê
wî Noel e û bawer di-
kin ku her sersalê ji za-
rokan re diyariyan dibe.
De em westiyar, rabin
ser xwe û em herin
razên. Şeva we bimîne
xweş.

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

Ji berpirsiyariya Welatê Me re

Ez Welatê Me bi
kêfxweşiyekê dixwî-
nim. Meseleyên Kur-
distaniyan bi zimanê
wan nivîsandin, têkoşî-
ne wisa ye ku nayê înkâr-
kirin. Ji bo vê yekê ez we
pîroz dîkim. Lê gava min
di hejmara we ya 3'yan,
di rûpelên 8 û 9'an de,
hevpeyvîna bi birêz T.
Ziya Ekinci re xwend, ez
heyîrîm. Dîsa jî min got
"Dibe çewtiyeke teknîkî
be", û min dest bi xwen-
dina nivîsê kir.

Li cem wêneyên Ve-
dat Aydın, Musa Anter,

Behçet Cantürk, Savaş
Buldan û Medet Serhat,
wêneyê sazûmanîkê şe-
bekeya kontrayan Cem
Ersever jî hebû. Ev tiştêkî
pir şerm e. Ji ber ku ew
kesên ku min navê wan
li jor rêz kirin, şehîdên
Kurdistanê ne. Wan tu
caran nedixwest bi qa-
tilên xwe re, di eynî rêzê
de cih bigirin. Ew heta
do tenê zarokên dê û
bavê xwe bûn, lê piştî ku
ew şehîd bûn, êdî bûn
şehîdê Kurdistanê. Bi
kurtasî hûn jî dizanin ew
kî ne. Ne hewceyê ez
bibêjim û ji bo qalkirina
wan, bi cildan pirtûk têrî
nakin. Heke behskirina
qatilên wekî Cem Ersever
pêwist bû, we wêneyê wî
li cihekî din bida, çêtir
bû.

Ez wekî mirovekî biêş,
xemgîn û li hemberî şehî-
dan bihurmet, bi tenê di-
karim bilez van tiştan bi-

nivîsim.

Hurmata xwe pêşkêşî
we dikim û ji we re ser-
keftinan ji dil dixwazim.

Nejdet Buldan

Serxweşiya serkeftinê

Heval di bin siya
zinafan de hilma
xwe vedidin, cihê
wan bilind e, di bin wê
bilindahiyê de, li jêr çem
diherike, ji aliyekî li ser
pirsgirêkên gel diaxivin,
ji aliyekî ve jî çavê wan li
dîmena çem e.

Yek ji wan dinêre ku li
wî aliyê çem, rûviyek li
ser dûvê xwe rûniştîye û
req bûye li nava çem

dinêre û dihire, di nava
çem de werdek (ördek)
diçêre. Heval çavên xwe
ji rûvî naqetînin û dîteli-
nin.

Rûvî, di dawîya poni-
jîneke hûr û kûr de radi-
be ser xwe û berê xwe
dide daristanê. Bîstekê bi
şûn ve rûvî hinek pûş û
palax dixê devê xwe û
derbasî wî alî avê (çem)
dibe. Xwe dipelîkîne bi
hemû û bi pisporiyeke
mezin, xwe berdide nav
çem. Wisa diçe ku
nahêle av bilebite. Bi alî-
kariya pûş û palaxê ku di
dêv de, xwe ji werdekê
vedişêre, heta ku nêzikî
werdekê dibe; ji nişka ve
dev dike qirika werdekê
û tîne li qeraxê çem datî-
ne.

Herdu lingên xwe yên
pêşîn radike, derdora
werdekê dihere û tîne bîhn
dike; lotikan dide xwe û
dîreşîse, dilxweş dibe.

Werdekê bêhn dike û
baz dide. Ji werdekê dûr
dikeve; ji çavan winda
dibe û car din tîne ser wer-
dekê bêhn dike; radişe
ser lingên paşîn û dîreşî-
se. Ev bîzava rûvî du-sê
caran wiha dom dike.
Rûvî dema ku ji werdekê
dûr dikeve, hevalek diçe
werdekê tîne. Rûvî cara
dawîn tîne ku bi werdeka
xwe kêfxweş bibê, çî bi-
bîne! Werdek ne li cihê
xwe ye. Rûvî hinekî dew-
sa werdekê bêhn dike û
dişopîne, çî çare!.. Wer-
dek winda bûye. Rûvî ji
kerban li wir dibêe rep û
dikeve.

Heval diçin dinêrin
ku, tu dibêjî qey heft sal
in ruh jê kişiyaye, rûvî
miriye.

Jêrenot:

Ev bûyer ne çîrok e.
Serpêhatîyeke gerîlan e.

M. Ali Mutlu

Ev roj ji bîr nabin!

Beriya hemû tiştî, ji
giştî xebatkarên roj-
nameya Welatê Me
re spasiyên xwe pêşkêş
dikim. Bawer bikin, nîza-
nim çî bibêjim. Ev rojên
dawiyê, yeko yeko rew-
şenbîrên me, rêberên me
ji nava me bi mûçinkê
hildikşînin. Rojnameya
rojane Özgür Ülke jî
bombe kirin.

Dilê me dikizire, keze-
ba me dişewite. Lê ev he-
ye, heta malbata min û
bav û kalên min hebin ev
ji bîr nabin. Bila bê zanîn.

Murat Aslanhan
Girtîgeha Ruhayê

Hejmara 7. a Welatê Me rastî destpêka sersalê hat. Sersala 95'an destpêka sala Ehmedê Xanî ye ji bo kurdan. Me xwest em rûpelên xwe bi nivîsên der barê sala Ehmedê Xanî de bixemilînin. Me xwe gihand gelek rewşenbîrên kurd da ku dîtin û hêviyên wan ên li ser sala Ehmedê Xanî bipirsin. Me xwest ku ew bi kurdî bersivê bidin. Her çiqas çend kesan hewl dan bi tirkî bersivê bidin, bi îsrarê be jî, yên ku hîç bi kurdî nizanin ne tê de, giştî bi telefonê an jî faksê bersivên bi kurdî dan. Jixwe bersivên bi tirkî jî, wê li navê Ehmedê Xanî nehatana. Hêviya me ew e ku, ev danûstandinên bi kurdî bibe destpêka bikaranîna kurdî, ji bo her warê jiyane. Mixabin, hetanî îro, kurdî di warên akademîk û ronakbîriyê de zêde nehatiye bikaranîn. Bi taybetî jî di nav kurdên bakur de -yên ku bi tirkî dizanin- bikaranîna kurdî pir bisînore. Çawa ku kurdî tenê zimanê çirokên kevnare an jî sohbetên pêkenokan be. Dema gotinê tê ser mijareke siyasî, wêjeyî, felsefî, dîrokî û hwd. kurdên ji bakur, ji nişka ve dev ji axaftina bi kurdî berdidin, dest bi tirkîyê dikin. Ez ne qala wan kurdên ku kurdiya wan zêde qels e, dikim. Ew ên ku, bi rastî, kurdiya wan ji tirkîya wan gelek çêtir e jî, bi giştî warê bikaranîna kurdî



JI WELATÊ ME

Mazhar GÜNBAT

Saleke xwerû bi kurdî

teng dikin. Gundiyên ku kurdiya wan, bêtir mubelexe, deh car ji tirkîya wan baştir e, dîsa bi çavê zimanê gund li zimanê xwe yê zikmakî dinêrin û di warên din de heta ji destê wan tê ji kurdîyê direvin. Esas, ew wisa bawer dikin ku tenê tirkî dikare bibe zimanê siyasî, wêjeyî, felsefî û zanistî. Dema mirov wan îqaz jî dike ka çima bi kurdî li ser wan mijaran napeyivin, hingê dibêjin: "Peyvên kurdî tîrî nakin. Mesela emê di şûna peyvên, politîka, diyalektîk, mekanîk, teknoloji, biyoloji, fizîk, coğrafya, medya, telefon, îdeoloji, makro, mikro, emperyalîzm, faşîzm, filoloji, antropoloji, romantîzm û hwd. de kîjan peyv bi kar binin." Li gorî zanîna wan ew peyvên îngilîzî û fransîzî giştî bi tirkî ne, ji ber vê yekê tirkî musaîtir e ji bo mijarên cîdî. Halbûku berdêlê zehfê wan peyvên di kurdî de hene, yên nîn in jî, jixwe bûne navneteweyî. Lê, li aliyê din, ne pêwîst e ku

peyvên em bi kar tînin ji sedî sed bi kurdî bin. Di tu zimanê de, ji sedî sed hemû peyv ne yê wî zimanî ne. Bi kurtî, jixwe pîrsgirêka kurdî ne hindikbûn an jî zehf-bûna peyvên e. Pîrsgirêk, bikarneanîna wî ye. Gelo çima kurdên ku tirkîya wan ji kurdiya wan qelstir e jî wisa bi tirkîyê ve girêdayî ne û baweriya wan bi kurdî tune ye? Bi dîtinê min, ew çav li rewşenbîr û xwendeyên kurdan dikin. Rewşenbîr û nivîskarên Kurdistanê bakur, bi giştî li ser mijarên cîdî û akademîk bi tirkî dipeyivin û dinivîsin. Kurdên nexwende û gundî wisa bawer dikin ku kurdî tenê zimanê gund e. Ew çav li xwendeyan dikin. Li gorî wan, ku kurdî zimanekî qewîn û tîkuz bûya li ser siyasî, wêjeyî, zanist û hwd. wê rewşenbîr û zanayên kurdan çima bi kurdî xebir nedana û nenivîsandana. Ji ber ku nivîskar, mamoste, rojnamevan, muhendîs,

parêzer (ebûqat) û xwendekarên kurd li ser mijarên cîdî bi kurdî naşitexilîn û pê nanivîsin, baweriya gundiya jî bi kurdî namîne, heta carinan şerm dikin ku di civînên girîng de bi kurdî dipeyivin. Ji ber vê yekê pêşî divê rewşenbîrên kurd ên ku bi kurdî dizanin û girîngiyê nadin, bêne rexnekirin. Di vê salê de, divê beriya her tiştî em zimanê kurdî ji şînorên çarçovekirî, ji şînorên gund xelas bikin, berê wî fireh bikin. Divê sala Ehmedê Xanî, bi hemû kurdan bide bawerîkirin ku zimanê wan tenê ne yê gundan û yê çirokên bapîr û dapîrên wan e. Eger girîngiya kurdî neyê fêmkirin, mîna zimanên din ên hemdem, zimanê kurdî layiqî hemû warên din neyê dîtin, hingê ne mimkûn e sala Ehmedê Xanî jî bigihîje hedefa xwe û layiqî Ehmedê Xanî be. Ma ew ne Ehmedê Xanî bû ku beriya sê sed salan bi zimanê kurdî li ser mijarên wêjeyî, siyasî, zanistî û yên herî kompleks bi kurdî dinivîsand û dida xwendin? Pêwîst e ku sala 95'an, ne tenê bi navê xwe bibe sala Ehmedê Xanî. Divê li gorî wî navî naveroka wê tije bibe. Werin em vê sala ku bi wî navê mezin pîroz dibe, bikin saleke xwerû bi kurdî. Piştî sê sed salên din jî be, em dilê Xanî geş bikin. Ber bi saleke

Ji bo Ehmedê Xanî

Bi biryara Konferansa Çand û Hunera Kurdî ya Yekemîn (1-3 Tîrmeh 1994) sala 1995'an wekî sala Ehmedê Xanî hate îlankirin.

Ji bo bîranîna 300 saliya nivîsandina destana kurdî Mem û Zînê, gelê kurd li Parîsê sala Ehmedê Xanî pîroz dike.

Di konferans û şahîyeke fireh de Xelata Edebiyatê ya fîlozofê kurd ê mezin Ehmedê Xanî wê were belavkirin.

Enstîtuya Kurdî li Berlînê bi karê organîzekirina sala Ehmedê Xanî radibe.

Em ji hemû rewşenbîr û welatparêzên kurd, ji her kesê ku ji Ehmedê Xanî û Mem û Zînê hez dike hêvî dikin, ji bo ku sal hîn xurtir derbas bibe, alîkariya madî û manewî bikin.

Enstîtuya Kurdî

Zossener Str. 41

10691 Berlin

Tel / Fax: 030 - 69 00 26 95

Konto Nr.: Kurdisches Institut für Wissenschaft und forschung
Ehmedê Xanî: 610023764 Berliner Sparkasse BLZ: 100 500 00

FERHENGOK

Amade: Hazir
Asayî: Hêsanî, asanî, rihetî
Aso: Ufq
Awa: Teşe, tarz
Azwerî: Hîrs
Berhem: Eser
Berxwerî: Îstîxsal, (tûketim)
Civat: Cemaat
Çalakî: Faaliyet
Daxuyanî: Beyanet
Diyar: Eşkere
Ezîmandin: Teşwîqkirin
Girîng: Muhîm
Helwest: Tawr
Komele: Cemiyet, dernek
Kovar: Mecmua (ceride)
Nîrx: Qîmet, hêjahî
Nîrxandin: Hêjandin (değerlendirme)
Pîşe: Meslek
Pîşasazî: Endustrî
Qerf: Henek
Raperîn: Serhildan
Rexne: Tenkîd (eleştiri)
Sazî: Muesese (kurum)
Vîn: Hemd, îrade
Weşan: Neşîr (yayın)
Zanist: İlm
Zarava: Diyalekt, lehçe

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
Mehmet GEMSİZ

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Samî TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Sırac AKSOY

NAVÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
249 13 44 - 245 29 91


ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ

(Temsilcilikler)
Hewlêr- Niwa Hebib
Suriye- Jan Dost
Fener Rojbiyanî
Berlin- Soliman Sidou
49-30-69 00 26 95
Badenwurttemberg-
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
Hamburg- A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
Bonn- Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
Amsterdam- Cotyar Xaxoy
31-20-613 07 66
Swed- Amed Tigris
46-8-740 69 81
Hannover- Selîm Biçûk
49-5721-813 60
Munchen- Mahmut Gergerli
49-871-670 884
Atina- Sirwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905

Digel gelek pêşveçûnên girîng di warên cur be cur de 94:

SALA GESBÛNA DÎPLOMASIYÊ



Sekretê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di 94'an de, li teniştî têkoşîna çekdarî di warên siyasî û dîplomatîk jî gavên girîng avêtin.

Kurdan di vê salê de, di gel cenga PKK'ê ya li dijî dewleta tirk, têkoşîna xwe ya di warê dîplomasiyê û siyasî de gur û tundtir kirin. Bi çalakîyên xwe ve, kirin ku sazî û rêxistinên navneteweyî biryarên girîng li hemberî Tirkîyeyê bistînin.

Kurdan saleke bi têkoşînê dagirtî li dû xwe hiştin. Di vê salê de gelek tiştên girîng qewimîn. Di nava van qewmînan de tiştine erênî û neyênî di gel hev cihê xwe standin û derbasî nava rûpelên dîroka vî gelî bûn.

Bi awayekî bi ser re ku li sala 1994'an bê nihêrtin, kurdan bêhtir di warê dîplomasiyê û siyasî de navê xwe bi raya giştî ya dinyayê dan bihîstin. Dewleta tirk jî di van waran de bêtevger nema. Heke sala çûyî jî bo kurdan û dewleta tirk bê nîrxandin:

Ji bo kurdan sala 94'an

Kurdan di vê salê de, di gel cenga PKK'ê ya li dijî dewleta tirk, têkoşîna xwe ya di warê dîplomasiyê û siyasî de gur û tundtir kirin. Bi çalakîyên (faaliyetên) xwe, kirin ku sazî û rêxistinên navneteweyî biryarên (qerarên) girîng li hemberî Tirkîyeyê bistînin. Wekî biryarên Parlamen-toya Ewropayê û Yekîtiya Ewropayê.

PKK di gel mezinkirina şerê xwe yê çekdarî, bi gavavêtinên dîplomatîk, Tirkîye di qadên navneteweyî de xiste tengasiyê. Ji bo vê yekê biryarên Konferansa Brukselê û nameya ku Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji serok û rayedarên dewletên Rojavahî re şandine, dikare wekî nimûne bîne nîşandayîn.

Kurdan çî li Tirkîyeyê û çî jî li derve gelşa (problema) xwe ji salê çûyî bêhtir dan muneqesêkirin.

Dîl û girtiyên PKK'yî, bi giştî, ji bo demeke dirêj derneketin

DGM'yan (Dadgehên Ewlekariya Dewletê) û awayê darizandina dadgehan protesto kirin.

PKK'ê ne tenê kurdên bakurê welêt, her wiha yên parçeyên din jî xistin bin pêşengiya xwe. Konferanseke ku hemû kurdên Sovyeta berê dinimîne (temsîl dike) li dar xist. Li gelek dewletan buro saz kirin, civîn pêk anîn. Di gel ku dewletên wekî Almanya û Fransa çalakîyên PKK'ê û ERNK'ê qedexe kirin û Îngiltere jî nûnerê ERNK'ê yê Ewropayê Kani Yılmaz girt, ev yek qewimîn.

Di vê salê de, tiştên ku ji bo kurdan bi awayekî neyînî (negatîf) hatin nîrxandin jî çêbûn.

Girtina DEP'ê, cezakirina mebûsan, kuştina ronakbîr, rojnamevan... û zengînen kurd; şewitandin û valakirina ji 2 hezarî zêdetir gund, kuştina ji 3 hezarî pirtir kes ji gelê kurd, bombekirina rojnameya Özgür Ülkeyê, cezakirin û girtina ji sedî bêhtir rewşenbîrî...

Lê ji hêla din ve bûyerên wekî girtina DEP'ê û cezakirina parlamenterên wê, kuştina insanan, girtina rewşenbîran li ba raya giştî ya dinyayê, li dijî Tirkîyeyê hate nîrxandin û dewlet hate sûcdarkirin.

Lihevixistina hêzên PDK û YNK'ê ku bi "şerê xwekujîyê" jî dikare bê binavkirin, di 94'an de jî bi temamî nesekînî û ji bo kurdan di nav çarçoveya tiştên neyênî de van bûyeran jî cihê xwe girt.

Ji bo dewleta tirk 94

Li gorî nîrxandinên pîsporên siyasî, ekonomîyê, sosyolojiyê, dîplomasiyê û hwd. dewleta tirk tu carî wekî vê salê neketiye tengasiyê. Rejîma kemalist ev sal di gelek waran de bi terkan (derzan) re rû bi rû ma.

Ji ber çalakîyên dîplomatîk û polîtîk ên kurdan, du wezîrên karê derveyî (Hikmet Çetin û Prof. Mümtaz Soysal) îstîfakirina kesên ku di qadê navneteweyî de Tirkîyeyê dinimandin ne tê de.



Di 94'an de li hemberî tengezariya sîstema dewletê Cem Boyner ji nava sermayedarên wekî xelaskerê sîstemê derkete sehneya siyasî.



Eger di 95'an de jî Tansu Çiller mîna 94'an bi fermanên generalan herêket bike, karê Tirkîyeyê dijwar e.

Di gel hewldanên xwe, Tirkîye di vî warî de bi ser neket. Li hundir jî li ser mijarên siyasî, di pergalê (sîstemê) de birîn ve bûn. Cem Boyner û partiya wî wekî berdevkê rejîmê û xelaskarê wê derketin holê. Ev parti bi gotinên tûj li hemberî pergalê derdikevê û dixwaze regekî din bide siyaseta Tirkîyeyê.

Li ser giranbûna barê ekonomîya şer, enflasyon li Tirkîyeyê gihiya %150, ku ev reqem li gorî daxuyaniyên fermî (resmî) ye. Tê gotin ku salê ji 400 trilyonî bêhtir (10 milyar Dolar) pere li hemberî PKK'ê tê xerckirin. Pîsporên aboriyê di-



Demirel di sala 94'an de jî dev ji demagogiyê berneda. Lê tîrsa generalan jî, her tim xwe li ser dida xuyakirin.

dine zanîn ku, dewleta tirk demeke dirêj nikare bi vî awayî li dijî PKK'ê li ber xwe bide û tevbigere.

Artêşa tirk jî ber şerê bi gerîla re, dema leşkerîtiyê dirêj kir. Ji 15 mehan derxiste 18 mehan. Hejmara firaran li gorî 93'yan bêhtir bû. Rayedarên dewletê bi xwe dadixuyînin ku hejmara kesên mişextê (qaçaxê) leşkeriyê ne, digihîje 300 hezarî.

Di dimenên jor de jî tê dîtin ku kurdan saleke ku bi qewmînan tije bû, li pey xwe hiştin û derbasî yeke nû bûn.

MEHMET GEMSİZ



Hatip Dicle



Leyla Zana



Ahmet Türk



Orhan Doğan



Selim Sadak



Sedat Yurttaş

Di 94'an de, dewletê bi hepiskirina mebûsên kurd kelemçe li îradeya gelê kurd da.